XEBATÊN ÇANDÎ



KURDÊN AZIRBÊCANÊ

A. Bukşpan

Amadekar & Werger: Têmûrê Xelîl

Weşanxana Înstîtûta Azirbêcanê ya Zanyarî-Lêkolînê

**

Bûkşpan A.

KURDÊN AZERBYCANÊ

Laçin, Kalbajar, Naxçîvan

Bakû, sala 1932a

Werger: **Têmûrê Xelîl**

KSS (Komara Sovyêtî ya Sosîyalîstîyê) Naxçiwanê

Bekû, sala 1932a

Pirtûkê da li ser bingeha nivîsên zanyarî yên kesên ji Awropayê (E.B.Soane, Mînorskî, Benzegr, A.Wîlson û yên din) herweha qala her çar perçên Kurdistanê, şerê kurda yê ji bo azadîyê (serhildanên bi serokatîya Bedirxana, Yezdanşîr, Ubeydulle), destdirêjayên împêrîyalîzmê, têkçûna biryarên Lozanê, mîrîtîya Şeddadîya û h.w.d. da jî tê kirinê.

Ev pirtûk piştî rêwîtîya êxpêdîsyoneke zanyarî li Kurdistana Sor, Naxçiwanê û Qerebaxê hatîye nivîsar û serokê êxpêdîsyonê A. Bûkşpan bi xwe bûye.

Di vê berhemê da çavkanîyên ji pirtûkên zaynar-rohilatzanên di cihanê da bi nav û deng hatine bikaranînê.

Kurdên Azirbêcanê (Laçîn, Kêlbecar, herêma Naxçiwanê)

P Ê Ş G O T I N

Ev pirtûka, ku em raberî we dikin, berhema xebata êkspêdîsyona taybetî ye li navçeyên berê yên devera Kurdistanê ya li Azirbêcanê (navçeyên Laçînê û Kelbecarê) û herêma Naxçiwanê, ku wek komarên otonom di nav KSS Azirbêcanê da nin. Ew êkspêdîsyon havîna sala 1931ê ji alîyê Komîsarîyata Perwerdeya Gelî ya Azirbêcanê (perça zanyarî) û Înstîtûta Azirbêcanê ya Zanyarî-Lêkolînê da (perça Rohilatê) hatibû teşkîlkirinê bona lêkolînê bikin, çika di nav kurdên Azirbêcanê da karê pêşxistin û belakirina çanda wan di çi rewşê da ne û çawa pêşda diçe.

Di nav pirsên, ku êkspêdîsyon gerekê li ser bisekinîya, yên here giring ew bûn, ku bi taybetîyên zimanê kurdên Azirbêcanê û komara otonom ya Naxçiwanê, mînanîhevbûn û cudatîyên zimanê kurdên Azirbêcanê û yên Ermenîstanê ra (piranîya wan êzîdî ne, lê nizanî ji bo çi heta niha jî di dokûmêntên fermî, salixên statîstîkîyê û yên mayîn da ew wek miletekî cihê têne nîşandanê) bibine nas, ji bo ku bikaribin li ser zimanê kurdî lêkolîna bikin û gorî wê jî pirtûkên dersa, berevokên zanyarî û yên mayîn bal xwe biweşînin.

Pirsgirêkeke êkspêdîsyonê jî ew bû, ku di karê vekirina dibistanên kurdî, kûrsên hilanîna nexwendîtîyê di nav kurda da û bi wan pirsa va girêdayî wan biryara pêk bînin, ku Şêwrdarîya miletên kêmjimar yên Azirbêcanê destnîşan kirine, ya ku di meha hezîranê sala 1931ê li Bekûyê hate derbazkirinê.

Bi tevayî êkspêdîsyonê pirsên dabûne pêş xwe, pêk anîn. Di vî alî da, wek ku di biryara civîna Komîsarîyata perwerdeya gelî ya 20ê îlonê sala 1931ê da tê gotinê, êkspêdîsyon di xebata xwe da bi ser ket.

Lê bi vê xebata bingehîn ra tevayî, tevbûyên êkspêdîsyonê çend tiştên bi armanca sereke ra girêdayî jî "ber çevê xwe ra derbaz kirin", wek: karê pêşxistina xwendin û çanda kurda di şertên jîyana eşîrîyê da, erf-edetên usa da, ku ne hinkûfî cûrê jîyana sosîyalîstîyê ne.

Demkurtîya êkspêdîsyonê (ji 2ê tebaxê heta 8ê îlonê sala 1931ê), gund û navçeyên kurda yên ji hev gelekî dûr, zehmetîyên bi çûyîna bal wan va girêdayî (xwesma li navça Kelbecarê), li ser riya bêqusûr pêkanîna daxazên me dibûne asteng. Ji me ra li hev nehat karê xwe usa biserxînin, wek ku ew yek serokatîya Partîya Komûnîstîyê danîbû pêşîya xwe bona bi her alî pêşdabirina çanda navçeyên gelên kêmjimar yên Yekîtîya Sovyêt, ku berê kolonîyayên Rûsîya

Qeyserîyê bûn, lê dû ra jî ketine bin destê hukumeta mûsafeta ya bûrjûazîyê-milkedarîyê da.

Kar û barên, ku me di dema êkspêdîsyonê kirîye, bona pêkanîna wê xebata mezin û dijwar têr nake. Û ew salixên ku em raberî we dikin, xwesma yên bi hesab û jimara va girêdayî, ji bo demên êkspêdîsyonê ne (tebax-îlona sala 1931ê) û rewşa wan navça ya îroyîn tam naynine ber çeva.

Lê gerekê bê destnîşankirin, ku xebateke awa barekî giran e û tenê kolêktîveke ji pêşekzan-têorêtîka, xwesma jî aborîzan-agrarzana, dikaribû di vî karî da bi ser keta.

Em bêjin, ku di nav endamên êkspêdîsyona me da tu aborîzanek tunebû.

Ev hemû nikaribû tesîra xwe li ser xebata me nekira.

Lê bi kêmanî, berraberdan û dibe şaşîyan ra tevayî jî me hewce dît vê xebata xwe çap bikin.

Û em gerekê ewê yekê hema niha bikin, ji ber ku nivîsên derheqa kurdên Azirbêcanê da yên di dema Sovêtîyê da derketî (ya dawî, sala 1929a), û nivîseke usa li ser rûpelên prêssa Pişkavkazê jî heye (rojnama "Zarya Vostoka"), ji rastîyê gelekî dûr in.

Di dawîyê ez, wek serokê êkspêdîsyonê, dixwezim sipasîya xwe ji hemû endam û tevgelên êkspêdîsyonê - Î.Morogûlov (kurdzan), ku me ew ji Ermenîstanê dewat kiribû bona tevî xebata êkspêdîsyona me bibe, Samed Şahsûwerovê kurd (mamostayê berê yê dibistana gundê Mînkendê, navça Laçînê, lê niha li Moskvayê dixûne), Îdrîs Hesenov (zimanzan, tirkzan, Bekû) û A.Alêkpêrov (êtnograf, Bekû) ra bêjim.

Ji navê êkspêdîsyonê razîbûna xwe didime rêxistinên partîyê û sovêtîyê yên navçeyên Laçînê û Kelbecarê, û herweha Komîtêya Şêwra Gelî ya komara otonom ya Naxçiwanê û Komîtêya herêmê ya PK Azirbêcanê, yên ku bi her awayî alî serketina xebata êkspêdîsyonê kirin.

Razîbûneke taybetî didime Komîtêya Perwerdeya Gelî ya Ermenîstanê û rêdaksyona rojnama "Rya teze", ku piştgirîya me kirin. Di dema seredana me ya demkurt li Êrîvanê (Yêrêvan, Rewan.- *NW)* karmendên Komîtêya Perwerdeya Gelî ya KSS Ermenîstanê, ronakbîrên kurd derheqa wê xebata xwe ya mezin da ji me ra gotin, ku wana di alîyê xebata çandî di nav kurdên Ermenîstanê da kirine û ev komara biratîyê - Komara Sovyêtî ya Sosîyalîstîyê ya Ermenîstanê - heta niha jî ew karê pîroz berdewam dike.

Kurdên Azirbêcanê
(Laçîn, Kêlbecar, herêma Naxçiwanê)

Casûsekî împêrîyalîzma Îngilîs yê herî bi nav û deng E.B.Soane, ku qala rasthatina xwe ya pêşin bi kurdên Kurdistana Tirkîyê ra dike, dinivîse: "Ew miletekî mezin û kubar e, ku li ser axên çiyayî yên Tirkîyê û Farizistanê (weke 125 hezar kîlomêtrên çargoşe) dijî. Rast e, warên jîyînê yên eşîrên kurda serhevdu riya 14 rojan ji Londonê dûr in, lê kurd yek ji wan miletên Rohilata Navîn e, ku ji hemîyan kêmtir lêkolîn ser wan hatîye kirinê".

Lê ev ewqasî jî ne rast e. Çend nivîsên bûrjûazîyê yên derheqa kurdên Tirkîyê û Farizistanê da hene. Û di nav wan da nivîsên bi zimanê îngilîsî jî cîyê yekemîn digrin. Em bêjin, ku Soane bi xwe bi kêmanî 10 berhemên derheqa kurda da nivîsîne (ew yek di wê bîblîografîyê da heye, ku di berhema wî ya dawî da çap bûye). Berhemên Rîç ("*Narrative of a Residence in Koordistan*", sala 1736a), Frêzêr (*Travels in Koordistan, sala 1840î*) û yên mayîn heta niha jî kemala xwe unda ne kirine.

Lê pirtûka Soane "*To Mesopotamia and Kurdistan in disguise*" du cara hatîye weşandinê û di pêşgotina çapa duda da, ku salka 1926a ronahî dîtîye, bi taybetî tê destnîşankirinê, ku fikrên Soane, ku ewî di salên 1908-1909a da gotine, hemî jî rast derketin û di wî alî da xebatên wî bi ser ketine. Emê hela vegerine li ser wê pêşgotinê. Em tenê bêjin, ku fikra Soane derheqa wê yekê da, ku li ser kurda kêm lêkolîn hatine kirinê, derheqa me da ne, û di wî alî da bin destê me da pir kêm nivîs hene ne tenê derheqa kurdên welatên dereke da, lê herweha li ser kurdên Pişkavkazê jî, û berî gişkî jî wê navça Azirbêcanê, ku heta sala 1929a bi fermî dihate binavkirinê wek Kurdistan.

Em nikarin wê yekê bêjin, ku edebîyata rûsa ya berî şoreşa Oktobir, xwesma jî nivîsên zabita, bi berhemên derheqa kurdên welatên dereke, xwesma jî yên Pişkavkazê va, dewlemend in. Berhemên Avêryanov, Karsêv, Mînorskî, gotarên N.Y.Marr, Trotêr, pirtûka Yêgîyazarov derheqa kurdên Êrîvanê da, hinek malûmatî û bîranînên derheqa kurda da, ku di nivîsên komîsyona arkêologîyê ya Kavkazê û nivîsên karmendên Qeyserîyê derheqa zevtkirina Kavkazê da hene - a evana hema bêje ew hemû nivîs in, ku bi zimanê rûsî derheqa kurda da hatine weşandinê**(1)**.

Em wê jî bêjin, ku di van berheman da, ku emê li jêr bi hûrgilî qala wan bikin, derheqa kurdên Azirbêcanê da hema bêje tu tişt tune.

Di edebîyata piştî Oktobirê da derheqa kurdên Azirbêcanê da ji wê jî kêmtir tişt hene. Xênji du kitêbokên Sîsoev û Çûrsîn yên derheqa êtnografîya (miletzanî) kurdên Azirbêcanê da, ku piranî dubarekirinên xudannivîsên berî şoreşê ne û di bingeha wan da sohbetên bi **Samed Şahsûvarov** ra nin (mamostayê dibistana gundê Mînkendê, navça Laçînê), tu tişt tune.

Haya me ji hesabdayîna profêsor V.A.Gûrko-Kryajîn derheqa êkspêdîsyona li Kurdistanê da heye, ku di havîna sala 1929a hatîye derbazkirinê. Lê ew nehatîye weşandin; mixabin, ew bin destê me da tune. Lê nivîsa Mamet derheqa wê êkspêdîsyonê da (kovara "*Îstorîk-Marksîst*", cild XVII, sal 1930, rûpel 81-83) û herweha du nivîsên V.A.Gûrko-Kryajîn yên derheqa ewê êkspêdîsyonê da, ku ewî wek înformasyon di rojnama "Zarya Vostoka" da çap kirine (16ê tebaxê sala 1929a, hejmar 186/2154 û 18ê tebaxê, hejmar 188/2156) me tînine ser wê bawerîyê, ku di fikrên V.A.Gûrko-Kryajîn da gelek şaşîyên sîyasî yên mezin hene, ew fikir dijî prînsîpên Marksîstîyê û Lênînîyê ne, di bingeha wan da îzbatîyên bê bingeh hene, ku ewî di dema êkspêdîsyonê da berev kirine.

A ev e ew hemû "berhem", ku di bin destê êkspêdîsyona Komîtêya Azirbêcanê ya Perwerdeya Gelî û Înstîtûta Zanyarî-Lêkolînê ya Azirbêcanê da heye, ku ev rêxistin bi xwe 2ê tebaxê sala 1931ê ew şandibû bona lêkolîna wan pirsa, ku bi pêşdabirina çanda kurda va girêdayî bûn.

Kurdistana Azirbêcanê diha nêzîkî paytextê KSS Azirbêcanê ye, ne ku London, ji Bekûyê heta Laçînê (navbenda Kurdistanê) riya ji rojekê jî kêmtir e.

Êkspêdîsyon 2ê tebaxê şev ji Bekûyê derket û rojtira dinê, 3ê tebaxê sala 1931ê êvarê, îdî li Laçînê bû.

(1) ***Bîblîografîya bi hûrgilî derheqa kurda da di gotara V.Mînorskî da heye, ku li "Ensyklopaedie des islam. Lieferung 36", sal 1928a, rûpel 1217-1240 da çap bûye.***

Ax û sînorên Kurdistana Azirbêcanê

Strûktûra malhebûnî ya Kurdistanê

Cîyên hêwira koçerên Tekelîyê

Niha em li ser wê pirsê bisekinin, çika ew çi herêm e, ku bi biryara PK Azirbêcanê sala 1923a hate binavkirinê Kurdistan û bû otonom? Gelo xerîta wê ya gêografî çawan e? Bin gotina *Kurdistan* an jî *herêma Kurdistan* da dihate fêmkirin ew ax, ku Azirbêcanê dabû kurda bona ew bi xwe serokatîyê li xwe bikin û ew herêma otonom sala 1929a ji holê hate rakirinê, bû qeza, ku tê da çar navçe hebûn: ji bakûr heta başûr: Kelbecar, Laçîn, Kubetli û perçekî navça Cebraîlê.

Sînorên qeza Kurdistanê ya berê dikete di navbera gêdûka Mûrovdaxê û besta Gencîyê. Kurdistan ji alîyê çemê Kengûr-Alangezê da ser sînorê qeza Nor-Bayezîdê bû, ku dikete di nav axa Ermenîstanê. Ji başûr-roavayê sînorên wê bi navçeyên Şarûr-Derelegezê û Zangêzûrê ra (KSS Ermenîstanê) hebûn.

Ji alîyê başûr-rohilatê va çemê Akerê bûbû sînorê wê û qeza Cebraîlê, û ew sînor ji gundê Efendîler va destpê dibû, dihat digihîşte heta çemê Mîlhelewê, ku ew jî dikete nava çemê Akerê. Alîyê mayîn da jî sînorê Kurdistanê bi Qerebaxê ra jî hebûn, ji başûr-rohilata çemê Akerê bigre, were hetanî gêdûka Mûrovdaxê. Perçê Kurdistanê yê bakûr çiyayî bû. Çûyîna navçeyên bakûr, xwesma navça Kelbecarê, pir zehmet bû û bi xeter bû jî. Başûrê wê, ku navçe Kubetlîyê li wir e, ser sînorê herêma rex çemê Erez bû.

Şertên Kurdistanê yên gêografî mora xwe li ser taybetîyên evê qeza Kurdistanê xistine û tesîra xwe li ser jîyana binecîyan û rengê evê herêmê bi tevayî kirîye.

Êkspêdîsyonê piranîya wextê xwe li ser lênihêrandina du navçeyên qeza Kurdistanê xerc kir - Laçînê û Kelbecarê, wextê mayîn jî da herêma Naxçiwanê, ku ser sînorên wê, yên li rex çemê Erez, kurd lê diman. Di nivîsa xwe da emê piranî li ser kurdên navçeyên Laçînê û Kelbecarê bisekinin, ji ber di nav jîyana wan û kurdên Naxçiwanê da ferq heye û ew di nav kurdên Azirbêcanê da cîkî taybetî digrin.

Strûktûra malhebûnî ya Kurdistanê

Pirsa pêşin, ku di dema bi wan esera ra (rêzûltat, mefa) dibî nas, ber te radiweste (xwesma dema bi xebatên Çûrsîn û piranî jî yên V.Gûrko-Kryajîn ra dibî nas), ew çareserkirina problêma derheqa strûktûra malhebûnî ya Kurdistanê da ye, ku V.Gûrko-Kryajîn bi wê fikrê va bi awakî erênî hel kirîye, ji ber ku rast texmîn kirîye, ku di jîyana koçerîyê û nîvkoçerîyê da karê kurdên qeza (devera) Kurdistanê yê sereke ew heywanxwedîkirin bûye.

Ev taybetîya cûrê jîyana malhebûnî, ku meriv dibê qey tenê bal kurdên Azirbêcanê heye, ji bo V.Gûrko-Kryajîn usa hewaskar bû, ku ewî sala 1929a di nivîseke xwe da ew cûrê jîyanê himberî cûrê jîyana koçerên Afxanistanê kirîye.

V.Gûrko-Kryajîn, ku jîyana kurda û afxana ya koçerîyê daye ber hev û ji bo himberîhevkirinê jî berhema akadêmîk Vavîlov ya derheqa xwelîbêcerkirinê li Afxanistanê da bi kar anîye, di gotareke xwe da ha nivîsîye: "Akadêmîk Vavîlov di xebata xwe ya bi nav û deng ya derheqa karê xwelîbêcerkirinê li Afxanistanê da destnîşan dike, ku ev cûrê pêwendîyên civakî gelekî sadene, ku berê weke 2 mîlyon koçerên heywanxwedîkir dide zozana". Û dû ra V.Gûrko-Kryajîn xebata Çûrsîn û gotinên çend xebatkarên kurd ji xwe ra dike bingeh û dinivîse: "Wek em dibînin, li Kurdistanê ne kêmtirî Afxanistanê ev pêwendîyên aborî-civakî yên gelekî sade û paşverû hetanî niha jî mane".

Îdî em derheqa wê yekê da nabêjin, ku ev rêzên ku di nîveka duda ya sala 1929a da hatine nivîsarê, dema ku karê çêkirina sosîyalîzmê li Azirbêcanê gumreh pêşda diçû û li ser dîwana Sovêtîyê li KSS Azirbêcanê ra 9 sal derbaz bûbûn, bi bingehê xweva buxdan e derheqa jîyana aborî-civakî da, ya Kurdistana Azirbêcanê da, û em dibînin, ku cûrê jîyana malhebûnî ya kurdên Azirbêcanê "hinekî" ji ya koçerên Afxanistanê tê cudakirinê.

Em binhêrin çika N.Î.Vavîlov derheqa koçerên Afxanistanê da çi dinivîse**(1)**: "Merî dikare ji destpêka havînê hetanî dawîya wê mêze bike, ku çawa milet bi rê û şiverêyên Afxanistanê, ji rohilatê, ji navbendê û başûr berê xwe didine zozana.

Bi seda merî barê xwe li ser deva, hêştira, hespa, guhdirêja (kera) barkirî, bi xwe jî peya ji başûr berê xwe didine bakûr. Tu dibêjî qey binecîyên gelek navça ji xelayê û birçîbûnê ji cî û warên xwe şihitîne û bûne mihacir, dane ser rê, ku nanê zikê xwe peyda bikin.

Tu welatekî mayînî usa tune,- çend rêza li jêr wê ew dinivîse,- ku perçekî miletê wî yê pir hertim ji cî û warên xwe rabe û ji bo demekê here ser axeke din kon û çadirê xwe vegire û bimîne. Eva bi rastî jî cûrê jîyana koçerîyê yê paşketî ye, ku ne tenê zirarê dide garana dêwêr û kerîyên pêz, lê herweha xwelîbêcerkirina welêt jî".

V.Gûrko-Kryajîn welatekî usa yê mayîn jî hinartîye (ber xwe derxistîye). Hela serda jî, bi bawerîya wî, ew welat bi wê yekê va jî tê cudakirinê, ku xênji cûrê malhebûna koçerîyê yê paşketî, rewşa aborî-civakî jî şûnda maye. Em bi kurtî li ser "ecêba" pêşin ya ku Gûrko-Kryajîn dîyar kirîye, bisekinin û mêze bikin ka rewşa civakî ya kurdên navçeyên ku me li wan dera lêkolîn kirine, çawan e.

Gelo li ser axa Kurdistana berê zozan hene? Dema ku havîna milet ji Şûşîyê destpê dike, bi riya Şûşî-Laçînê bi barê xwe berê xwe dide Kurdistanê, usa tê texmînkirinê, ku koçerî karê binecîyên wan navça yê sereke ye. Lê di rastîyê da ne usan e û gerekê ew yek jî bidne ber çeva, ku zozanên Laçînê (Lul-per) û Kelbecarê ne tenê ji bo binecîyên der-dorê wan in. Gelek binecîyên Azirbêcanê yên mayîn jî têne vira, ku li deşt û arana dijîn, ji ber ku havîna li wir pir germ e, li gelek cîya jî av tune, teva wan dera usa diqijilîne, ku şînkayî û debara heywana dişewite. Koçerên Mûxanê, yên ji bestên Mîlê û Qerebaxê jî têne van dera û ne tenê havîna. Binecîyên ji qebîla Efşara çend sed kîlomêtra didine ber xwe û bi neferên mala xwe û heywanên xwe va tevayî ji Exdamê û Berdê dertên û di nav 2-3 meha da tên, digihîjine zozanên rex çemê Kurrê.

Hewa hênik, best û beyarên bînxweş, kanîyên avilheyatî binecîyên Azirbêcanê berbi xwe dikişînin. Wek xuya ye, ev hemû bûne sebeb, ku V.Gûrko-Kryajîn Kurdistanê himberî Afxanistanê kirîye.

Ev warên buhuştî V.Gûrko-Kryajîn ewqas kor kirîye, ku ew tiştê ku tenê hinkûfî jîyana koçeran e, bi temamîya binecîyên Kurdistanê va daye girêdanê. Em wê yekê înkar nakin, ku heywanxwedîkirin ji bo navça Laçînê karekî giring e, lê ji bo navça Kelbecarê jî hema bêje karê yekemîn e. Lê rol û kemala wê hindava van herdu navça da jî di jîyana malhebûnî da ne wekehev in.

Em bêjin, ku di navça Laçînê da ne tenê heywanxwedîkirin cûrê jîyanê yê sereke ye. Vira binecî bi xwelîbêcerkirinê va girêdayî ne, hela ser da jî, li wan gunda, ku kurd lê pirtir in, xwelîbêcerkirin ser heywanxwedîkirinê ra ne. Wek mînak, li gundên Axcekendê, Bozluyê, Mîrikê, Kemallîyê, Çeraxluyê, Kelecê, Qere-Keşîşê, Zêrtîyê rewş usan e. Ew yek li Mînkendê jî usan e, ku gundê navça Laçînê yê herî mezin e û wî çaxî kemala wî pir bû di nav jîyana malhebûnî ya wê navçê da.

Axa ku serê her malekê ra kivş kirine, ji 4-4,5 hetanî 6 hêktaran e û em wê jî bêjin, ku ji bo bêcerkirina xwelîyê aletên here kevnare têne bikaranînê.

Gorî salixên dayîra Plana dewletê ya KSS Azirbêcanê, tevaya mezîla erdê navça Laçînê, ku tê bêcerkirinê, sala 1931ê da 11.870 hêktar bû. Mezîla zozana gelekî ser mezîla erdê bêcerkirinê ra ye. Li zozana 63.227 hêktar xwelî heye. Lê dîsa jî, ev reqemên ku me anîn, nikarin tam reng û rûyê rewşa malhebûnî ya vê navçê bînin ber çevan. Gerekê wê yekê jî hildine ser hesêb (bidne ber çeva), ku zozanên navça Laçînê, wek ku me li jorê destnîşan kirîye, xizmetî gelek navçeyan dikin, ku bi mezîla axa xwe va çend cara ser axa navça Laçînê ra nin.

Rewş li navça Kelbecarê cûrekî mayîn e. Gorî salixên beşa fînansîyê ya navça Kelbecarê, mezîla hebê nên sala 1931ê dikir weke 4518 hêktar, lê tevaya mezîla bêcerkirinê 11 hezar hêktar e. Lê eger em bidne ber hesaba, ku mezîla bona çandinîya gîha 94.529 hêktar e û ew tenê bona heywanxwedîkirinê tê bikaranînê, û ew yek jî, ku ew mezîl nayêne avdanê û baran û teyrok û zîpik gelek cara nahêlin, ku debara baş ji wan mezîla hilînin, wî çaxî wê rind bê ber çeva, ku ebûra binecîya piranî ji heywanxwedîkirinê dibe. Wargên çiyayî alî heywanxwedîkirinê dikin, lê di alîyê mayîn da jî nahêlin karê xwelîbêcerkirinê

pêşda here. Di navça Kelbecarê da tu rê tunene, lê şiverêyên li çiya û banîya him bona meriva, him jî bona heywana bi xeter in. Lê di navça Kelbecarê da heywanxwedîkirin bi xwelîbêcerkirinê va girêdayî ye û li wan cîyên ku xwelî dikare bê bêcerkirinê, binecî ji dest xwe bernadin. Tiştekî femdarî ye, ku di van şerta da mezîla xwelîya bêcerkirinê, ku serê her malekê ra dikeve, çend cara ji ya navça Laçînê kêmtir e û hinek gunda da digihîje hetanî nîv hêktarî. Lê em çi jî bêjin, kurdên navça Kelbecarê (em îdî derheqa kurdên Laçînê da nabêjin), ne koçer in û wana nikarî himberî koçerên afxana bikî, wek ku V.Gûrko-Kryajîn dixweze ewê yekê nîşan bide.

Wek ku bêlî ye, hilgêr-dagêra herdemî, gava warê te yê jîyînê herdem ne li cîkî ye, çûyîn-hatina bi seda kîlomêtra ji bo koçera astengên mezin çê dikin.

Me li jor nimûna çûyîna koçerên Afxanistanê li zozana anî. Me herweha got, ku li Kurdistanê jî koçer hene, lê wek me destnîşan kirîye, koçerên usa di nav kurda û binecîyên mayîn da tek û tûk in. Bona wan koçera çûyîna li zozanên Kurdistanê tenê ji bo ser demekê ye, lê ne cûrê jîyana wan e.

Piranî kurd di hemû demsalan da diçine zozana û ewê çiqas wext li zozana bin, ew jî bi hewayê û daberê (alif, êm) va girêdayî ye.

Bi wan ra tevayî ev eşîrên turk jî piranîya havînê li zozanên navça Kelbecarê, nêzîkî der-dorê Îstî-Sûyê derbaz dikin, ku ji deşta rex çemê Kurrê têne vira: Teterler, Aşixli, Xelaç, Keberli, Murtuli, Efşar, Karadonli, Sarhekli, Alî-Êndixli (ji navçeyên Salyanê û Axcebadê), Texli (ji navça Berdînê), Merzîlê û Kengerliyê (navça Axdemê) û yên mayîn.

Di dema êkspêdîsyoinê em çûne du zozanên usa: bal Teterlera, ku warên xwe li nêzîkî Îstî-Sûyê danîbûn û bal Tekelîya, ku konên xwe nêzîkî gundê Mînkendê vegirtibûn.

Li jêr em riya mayîna (hêwira) koçerên Tekelî raberî we dikin, ku wana bi xwe ji me ra gotine.

Cîyên hêwira koçerên Tekelîyê:

Wek ku ji vê navnîşê xuya dibe, hinek koçerên Azirbêcanê demeke havînê li zozanên Laçînê û Kelbecarê da derbaz dikin, ku ji navçeyên mayîn têne vira, carna jî ji cîyên çend sed kîlomêtra dûr jî.

Em careke din jî guhdarîya we didine li ser gotinên *ji navçeyên din,* ji ber ku ew tê wê manê, ku ne tenê koçerên ji herêma Kurdistana berê têne wira.

Em înkar nakin, ku piranîya wan koçera binecîyên turk û kurdên navçeyên nêzîk in. Lê hatina wan ya wir nayê mana, ku ew koçer in.

Niha em mêze bikin çika ev hemû çi tesîrê li ser binecîyên kurd yên wan navça dike, ku em ji bo lêkolîna çûne wira.

Em bêjin, ku di herdu navça da kurd tenê li gunda bi karê malhebûnîyê va mijûl dibin. Vira qijle û zozan tunene, wek ku ew li warên koçerên Azirbêcanê da

hene. Lê eva nayê wê manê, ku li vira zozan qet tunene. Ewana hene, lê tenê ji bo havînan e. Lê gotina *gund* jî li vira tê manaya qijlê û zozanê. Rast e, ew gundên, ku binecîyên wî qet naçine zozana, kurd jê ra dibêjin "obe", ku tê wê manê, ku ew malhebûneke koçera ya demkurt e, ku çend mal gihîştine hev û malhebûna xwe pêşda dibin.

Zanyar S.A.Yêxîyazarov**(2),** ku li ser pirsên Êrîvanê lêkolîna dike, gotina "obe" bi vî awayî şirovedike: "Obe",- ew dinivîse,- hemjîyîna ser demekê ye; ew her sal berî dema koçerîyê tê sazkirinê û heta payîza dereng berdewam dike, dema kurd îdî vedigerine warên xwe yên berê".

Navê "obe", ku li ser çend gunda maye, ji demên buhurî di bîra gundîyan da maye, gava piranîya gundîya koçer bûn. Lê di rastîyê da gelek gundên ku me lêkolîn li ser kirine, zozanên wan tunene, û wek ku em pê hesîyan, berê jî tunebûne. Di navça Laçînê da gundekî usa gundê Zêrtîyê ye û ew hemû gundin, ku dikevine nava şêwra gundê Bozlûyê. Piranîya wan gundîya xwelîbêcerkir in, ji ber wê jî hewcedarî tune heywanên xwe yên kêmjimar bibine zozana.

Di nava koma duda da ew gund in, ku zozanên wan ji gund ne gelekî dûr in, ew an berdewama gund in, an jî perê gund da nin. Piranîya gundên navçeyên Laçînê û Kelbecarê ji wan gunda nin. Bona gotina xwe diha zelal bikin, em li jêr evê navnîşê raberî we dikin:

Navça Laçînê *(Dûrbûna zozana ji gunda)*

Kizil-Boxaz ji Mînkendê - 4 kîlomêtra

Kerenglik ji Axcekendê - 7-8 kîlomêtra

Kerenglik ji Kerekeşîşê - 7-8 kîlomêtra

Yedî Boluk ji Ax.-Bulakê 7 kîlomêtra

Navça Kelbecarê *(Dûrbûna zozana ji gunda)*

Axcekend ji Şûrxanê - kîlomêtrek

Baxirsak ji Soyux-Bulaxê 8-9 kîlomêtra

Gîlî ji Zeylikê - 10 kîlomêtra

Gîlî ji Axcekendê - 2 kîlomêtra

Û ya dawî, di koma sisîya da ew çend gundên herdu navçan in, ku zozanên wan ji 10 kîlomêtra zêdetir dûrî gundê wan in. Gundên usa pir hindik in. Em wê jî bêjin, ku binecîyên van gunda (wek mînak, Kere-Kax, gundên ku dikevine nava şêwra gundê Ebdalyerê, navça Laçînê) bi xwelîbêcerkirinê va mijûl in.

Rastîya bawerîyên me, ku koçerî cûrê jîyana kurdên navçeyên Laçînê û Kelbecarê nîne, bi wê yekê va jî tê îzbatkirinê, ku di dema koçerîyê da pevgirêdana di navbera gunda û zozana da nayê qutkirinê.

Berî her tiştî lazim e bê kivşkirinê, ku piranîya gundên xwedî zozana, tenê 1,5-2 an jî herî pir 3 meha diçine zozana. Ew jî ne hemû gundî diçine zozana, lê tenê pareke wan, ku piranîya wan jî jin in û zarên hetanî 18 salî ne. Li navça Kelbecarê, li ku wek me destnîşan kirîye, heywanxwedîkirin karê yekemîn e, çend gund hene, ku tenê 1,5-2 meha gundên xwe dihêlin, diçine zozana. Lê di wan şertan da jî, heywanxwedîkirin û xwelîbêcerkirin ji hev qut nabin, pevgirêdana gund bi zozana ra nayê birînê. Bona gelek gundên navçeyên Laçînê û Kelbecarê çûyîna li zozana qet nayê texmînkirinê, lê di navça Laçînê da ew çûyîn qet tesîrê li ser jîyana malhebûnî ya navçê nake. Piranîya gundîya di nav salê da naçine zozana. Zirara, ku zivistan digihîne wan, ne zêde ye, lê ew bi sebebên mayîn va têne şirovekirinê û tu eleqê wê yekê bi bîr û bawerîyên V.Gûrko-Kryajîn ra tune, ku kurdên Azirbêcanê dişibine afxanên koçer.

Piştî van hemû tişta, tu şikberî di wê yekê da tune, ku serokê êkspêdîsyona Kurdistanê ya sala 1929a piştî lêkolînên xwe hate ser wê bawerîyê, ku li ser kurdên Azirbêcanê çawa difikirî, usa jî derket.

Di vî alî da rewş li herêma Naxçiwanê da lap bi teherekî mayîn e. Kurdên Naxçiwanê, ku ber kenarê çepê yê çemê Erez dijîn, ku li ser sînorê Tirkîyê û Îranê ye, û piranîya wan jî der-dorê Erezdayanê dijîn, ku dikeve navbera KSS Naxçiwanê û Komara Ermenîstanê, bi cûrê jîyana xwe va ji kurdên navçeyên Laçînê û Kelbecarê lap cuda dibin.

Em dikarin kurdên Naxçiwanê wek koçer jî bi nav bikin, lê ne bi tam (temamî). Berî her tiştî ji bo wê yekê, ku cûrê jîyana wan ya malhebûnî piranî heywanxwedîkirin e. Piranîya warên kurda, ku dikevine ser xeta riya Cûlfayê, ne yên herdemî ne, ew ser demekê li wan deran dijîn. Zozanên Ayrîcê, ku li Ermenîstanê ne, 60-70 kîlomêtra ji warên wan dûrtir in. Hilgêra li zozana ji destpêka nîsanê destpê dike û 1ê çirîya pêşin ne zûtir xilaz dibe. Ango, dema zozana 7 meha dikişîne, û di mehên çirîya paşin û çileya pêşin da kurd li navçeyên nêzîkî warên xwe dimînin, û tenê paşê, di dawîya çileya pêşin da vedigerine malên xwe.

Kurdên Naxçiwanê dema ji warên xwe diçine zozana, pevgirêdanên xwe bi malên xwe ra lap didine birînê.

Wê demê ew herêm bi temamî wek warekî xik û xalî ye. Carna me komên kurda yên ji 10-15 meriva didîtin, ku ji zozana hatibûn bona tivdîra zivistanê bikin, debarê bidne ser hev. Malên, ku bêxweyî hîştibûn, mînanî kelefa bûn, heta qerewil û nobedar jî ber tunebûn.

Rewş li herêma Naxçiwanê bi vî awayî ye. Wek ku em dibînin, kurdên Naxçiwanê dikarin wek koçer, diha rast - nîvkoçer bêne hesibandinê. Lê hindava wan da jî ew fikir ne rast e, ku ew di hêla jîyana civakî-aborî da pir paşketî ne.

(1) ***N.Î.Vavîlov û D.D.Bûkînîç; "Zêmlêdêlçêskîy Afxanistan", Îzdatêlstvo Vsêsoyûznogo Înstîtûta prîkladnoy botanîkî î novîx kûltûr prî SNK SSSR î Gos. Înst. Opîtnoy agronomîî NKP RSFSR, 1929g, str. 85 î 86.***

(2) ***S.A.Yêgîyazarov. Kratkîy êtnografîçêskîy oçêrk kûrdov Êrîvanskoy gûbêrnîî. Zapîskî Kavk. otd. împêrator. rûsskogo gêografîçêskogo obşêstva, knîjka XIII, vîpûsk 1. Tîflîs, 1891.***

Kurdên Azirbêcanê- Pêwendîyên civakî-aborî li bal kurda

Eger **V.Gûrko-Kryajîn** şaş kirîye, dema cûrê jîyana malhebûnî yê kurdên Azirbêcanê (yên herêma Kurdistana berê) beramberî cûrê jîyana afxanîya kirîye, û eger ew şaşîtî ji dest wê yekê ye, ku ew serra-berra bi jîyana binecîyên navçeyên ku kurd lê dimînin ra bûye nas, lê ewî di hindava pêwendîyên civakî-aborî yên wî miletî da şaşîyên mezin berdane, û ew şaşî dikarin wan meriva bixalifînin, yên ku bi lêkolîna pêvajoya pêşdaçûyîna bi riya nekapîtalîstîyê ya di şertên Sovêtîyê va mijûl dibin. V.Gûrko-Kryajîn li ser bingehê lêkolînên xwe (wek em hatine bawerkirinê, bi tevayî tu tiştekî îzbatîyên wî bi rastîyê ra tunene) hatîye ser wê bawerîyê, ku pêwendîyên civakî-aborî di nav kurda da yên bi cûrê eşîrtîyê ne.

Rast e, V.Gûrko-Kryajîn ew pêwendî bi nav kirine wek yên jihevçûyî, ku dewra xwe îdî buhurandine. Ev taybetî di wê yekê da ne, wek ku xudanê nivîsê destnîşan dike, ku di jîyana eşîrtîyê da, wek nimûne, di "oba" da, "em texmîn dikin, ku cûrê jîyana eşîrtîyê difelişe, destbi cûrê jîyana pêşketî dibe, li ku dîwan di dest milet da ne".

Em wê jî bêjin, ku fikrên V.Gûrko-Kryajîn yên piştra hinek cîya dijî hev in. Dema ew sîstêma jîyana "oba" ya kurdên Êrîvanê himberî ya kurdên Azirbêcanê dike, dinivîse, ku cûrê jîyana kurdên Azirbêcanê diha dêmokratîk e, ne ku yê Êrîvanê. Lê berê V.Gûrko-Kryajîn fikrên lap eksî vê gotine.

Usa dertê, ku diha dêmokratîkbûna "obe"yên Azirbêcanê bi saya serê dîwana Sovêtîyê ye. V.Gûrko-Kryajîn bi vî awayî fikrên xwe mak dike: "Em dibînin, ku bal kurdên Azirbêcanê, xwesma piştî hukumê Sovyêtî, cûrê jîyana "oba" bi teherekî mayîn e (himberî cûrê jîyana kurdên Êrîvanê.- ***A.B.***). Vira jî milet ne bi tek-tûka, lê bi koma (qefla) dewsa mala kona bi kar tîne. Berê dema navçê dixwest zozanên wê hebin, ewê ji koçera an jî bega ax kirê dikir. Piştî testîqbûna dîwana Sovêtîyê,

ew axê ji dayîrên ku karê parevekirina xwelîyê va mijûl dibin, distînin û ew gorî jimara neferên malê û heywana perçekî axê ji koçera û milkedara distînin û didine wan".

Em îdî derheqa wê yekê da nabêjin, ku xudanê nivîsê tu tişt nabêje derheqa pêvajoyên nû yên di nav sîstêma "oba" da, ku xudêgiravî (qaşo) hetanî niha jî bal kurdên Azirbêcanê wek berê mane û ji bo wê yekê îzbatîyên usa tîne, ku kenê meriva tê.

Wek ku ji miqelên V.Gûrko-Kryajîn xuya dibe, salixên (malûmatîyên) derheqa kurdên Êrîvanê û sîstêma "oba" ya wira da ewî ji xebata Yêgîyazarov ber girtîye, ku ewî sala 1878a nivîsîye û, bi gotina wî, lê hela nehatibû çapkirinê. V.Gûrko-Kryajîn ne daye ber çeva, ku di navbera weşandina miqalên wî û xebata Yêgîyazarov da weke nîv sedsal heye. Ewî ew yek tê berdaye, ku di nav wê demê da, him li Ermenîstanê,- herêma kurdên Êrîvanê da, him jî li Azirbêcanê Şoreşa Oktobirê bûye û "oba" Êrîvanê jî di nav wê demê da gelek guhêrîye.

Me dikaribû guh neda evê şaşîyê, eger ew bê hemdî xudanê nivîsê bûye, an jî eger ewî bigota, ku ew bawerîyên wîne. Lê vira xeter di wê yekê da ne, ku temamîya sîstêma bûrjûazîyê, Marksîstîya qelp, oportûnîstîyê, ku heta van dema jî tesîra wê li ser karê rohilatzanîyê hebû, rola Oktobirê û kemala Şoreşa Oktobirê him di jîyana Rohilata welatên dereke, him jî ya navçeyên paşketî yên Rohilata Sovêtîyê fêm ne dikirin û qîmet ne dikirin. Em dibînin, ku cûrê jîyana nû ji guhdarîya V.Gûrko-Kryajîn û hevalbendên wî der mane. Hema ev yek xudanê nivîsê tîne ser wê bawerîya şaş, ku temamîya rola Şoreşa Oktobirê li ser Kurdistana Azirbêcanê ew bû, ku "obên" Azirbêcanê yên nû diha dêmokratîk in, ne ku yên di salên 80î yên sedsala XIXa li Êrîvanê hebûn.

V.Gûrko-Kryajîn, ku ewê îzbatîyê bi testîqbûna dîwana Sovêtîyê li Azirbêcanê va dide girêdanê, dinivîse, ku "niha wek ku xuya ye, serkarîkirina "oba" ketîye destê endamên şêwra gunda".

Bi gotina V.Gûrko-Kryajîn hema ev e serdestîya jîyana cûrê eşîrtîyê - "oba", di dema Sovêtîyê da, di dewrana piştî Şoreşa Sosîyalîstîyê da.

Piştra V.Gûrko-Kryajîn ev fikrên xwe yên sereke berdewam dike.

Emê li jêr dîsa vegerine li ser azirûkirina van pirsa.

Lê niha em bala xwe bidin çika V.Gûrko-Kryajîn rewşa kurdên Azirbêcanê ya berî dîwana Sovêtîyê, berî Şoreşa Oktobirê çawa tîne ber çeva. Derheqa vê yekê da ew ha dinivîse: "Berî dîwana Sovêtîyê di van navçeyên gelek paşketî da pêvajoya sazkirina malhebûna bi cûrê eşîrtîyê serdest bû û, bi gotina Êngêls, "cûrê jîyana eşîrtîyê tam ji bin destê milet derketibû û ketibû bin destê derebeg û milkedara, yên ku zordarî li milet dikirin û hukumê xwe li sitiyê milet dialandin".

Ev gotinên Êngêls ("*Proîsxojdênîyê semiî, çastnoy sobstvênnostiî î gosudarstvo*", *îzd. Pêtrogr. Sovêta R. î K. D. 1918g., str. 69*) ("*Xuliqandina malbatê, arzîtîya teknevsî û dewlet*", *weşanxana Pêtrogradê ya Şêwra R. û K. D. sal 1918, rûpel 69*), ku V.Gûrko-

Kryajîn di nivîsa xwe da bi kar anîye, tu şikberîyê nahêle, ku bi bawerîya wî kurdên Azirbêcanê berî dîwana Sovêtîyê di nav rewşa here xirab da bûn, dihatine talakirin û şêlandinê.

Mixabin, di bin destê me da serkanîyên nivîskî tunene, ka rewşa wan kurda ya civakî, ku di salên 70-80î yên sedsala buhurî li ser axa Kurdistanê diman, çawa bûye. Lê çi nivîsên ber destê me hene, îznê didine me em bêne ser wê bawerîyê, ku berî ku qeydê Sovêtîyê li Pişkavkazê bê testîqkirinê, rewşa kurda rewşeke wek nemir-nejîyînê bû.

Jihevçûna civaka kurdên Pişkavkazê gelek dema berî hukumê Sovêtîyê destpê bûbû. Îzbatîyên V.Gûrko-Kryajîn û Yêgîyazarov tenê derheqa cûrê jîyana kurda ya eşîrtîyê-qebîltîyê bi awakî zelal tînine ber çeva. Hela di wan dema da axa an jî milkedarên, ku warên koçerîyê di bin destê wan da bûn, serkarî li "oba" dikirin**(1)** û eva yeka ji bo V.Gûrko-Kryajîn bûye delîl, ku kurda wek miletekî pir paşketî nîşan bide.

Karê axê yê kardar ew bû, ku ew rola teşkîldarê malhebûna heywanxwedîkirinê dilîst. Lê ew rol ne ji wê yekê dihat, ku ew ketibû heyra milet da, lê ji bo dewlemendbûna wî bû û hebûna wî jî ji wê yekê dihat, ku axên zozana bin destê wî da bûn.

Serokê "obê", ku jê ra "axa", an jî "rûsipî" digotin, keda wan şivana dixwer, ku ewî kirê kiribû bona herine ber kerîyê pêz û garana dewara, zor li miletê "obê" dikir û bac ji wan berev dikir.

Axatî ji nisletekê derbazî nisleteke mayîn dibû, ji bavê derbazî kur û nebîya dibû.

Fûnksîyonên "teşkîldarîyê" yên "axa" wî çaxî ji holê radibûn, dema hebûna wî ji dêst diçû. Wek ku Yêgîyazarov destnîşan kirîye, "hema ku ew (axa) feqîr dibû, axa bin destê wî derbazî destê merivên diha dewlemend dibû, lê ew jî dibû endamekî olkê yê sade"**(2)**.

Xênji zêrandina di nav olka xwe da, kurd ji alîyê derebegên xwe û yên der va jî dihatine zêrandinê, ku ji wan ra "bavê milet", "êlbeg", xan digotin, an jî derebegên turk zordarî li wan dikirin, ew jî bi wê va girêdayî bû, çika ew li ser axa kêne.

Zêrandina kurda bi zêdebûna hasileta malhebûna gundîtîyê va pirtir dibû û ew pêvajo ewqas wext berdewam bû, heta kurd ji jîyana koçerîyê derbazî jîyana riatîyê bûn. Em ser wê bawerîyê ne, ku bona kurdên navçeyên Kurdistana berê, ku me lêkolîn li ser wan kirine, koçerî karê gelek sala berê bûye û ew jî ne bi daxaza dilê wan bûye, lê ji wê bûye, ku ew di nav koçera da diman û gelek tişta da çev didane wan.

Me îdî derheqa wê yekê da gotîye, ku hetanî îro jî li ser axa herêma Kurdistanê gelek koçerên Azirbêcanê tên û derbaz dibin û bi kurdên riat ra danûsitendinan çê dikin.

Vira cîye em gotinên Marks yên derheqa wê yekê da bînin, ku di van şerta da diha pir pêwendî çê dibin, karê malhebûnîyê baştir pêşda diçe, cûrê kirîn-firotana bi pera pêşda tê.

Em binhêrin çika Marks derheqa vê yekê da çi dinivîse: "Gelên koçer ji hemîyan zêdetir hewcê cûrê kirîn-firotana bi pera ne, ji ber ku temamîya hebûna wan hasilet û xurekê malhebûna gundîtîyê ye û cûrê jîyana wan usan e, ku ew mecbûr in xurekên xwe bifroşine merivên ku cûrê jîyana wan ji wan cuda ye"**(3)**.

Di hêlekê da koçer bi dinya dervayî xwe ra dihatine girêdanê, di hêleke mayîn da jî ew di dema kirîn û firotanê diketine destê derebegên mezin, ku him bi kîsî wan dewlemend dibûn, him jî ew dizêrandin.

Dema ku Azirbêcan nû bûbû komara Sovêtîyê, vira hukum di dest du malbetên derebeg-milkedarên mezin da bûn - malbeta Sultanov beg û Koturli beg.

Navçeyên Laçînê, Kelbecarê û Kubetlîyê di dest begên turka yên ji malbeta Sultanova dizêrîyan. Hukumeta mûsafeta hukumê wan nas dikir û serkarîkirina herêmê di dest Sultanova da bû, lê yek ji wê malbetê jî - Xosrow beg Sultanov, hatibû kivşkirinê wek welîyê Qerebaxê.

Di navbera serekeşîra û derebeg-milkedarên ji malbeta Sultanova da carna nerazîbûn hebûn, heta pevçûn jî dibûn, lê herdu jî karek dikirin - milet dizêrandin.

Begên Koturlînê, ku heta serketina şoreşa Oktobirê li Azirbêcanê di navça Kelbecarê da hukum di dest wan da bû, 80 hezar hêktar erdê rêj (ku tê bêcerkirinê) û 45 hezar hêktar erdê dêm (ku nayê bêcerkirinê, xozan) xistibûne bin destê xwe.

Wek ku binecîya ji me ra gotin, ji wan bega yê herî feqîr - Qadî begê Rizabeg oxlu, xweyê 105 çêlekên doşanî, kerî-sûrîya, xulam û xizmetkara bû.

Gundîyên navçeyên Laçînê û Kubetlîyê di hêla aborî da bin destê begên Sultanova da dizêrîyan. Bacên mezin ji wan distendin, xweserîtîyên nebînayî dikirin, heta mafê şeva pêşin jî di dest wan da bû (razana şeva pêşin bi bûka teze ra).

Gundîyên Kelbecarê û Laçînê hetanî niha jî nikarin rehet navê zordestên xwe yên berê bînine ser zar-zimana. Gundîya gelek nimûne ji me ra dianîn, ku malbeta Sultanova di dema hukumdarîya xwe li Kurdistanê çi ecêb-nenere anîne serê wan, çawa ew zêrandine, talan kirine, şêlandine, kuştine.

Destên malbeta Sultanova heta enîşkê di nav xwîna gundîyên sexîr da ne, hebûna wan bi saya serê xûdana enîya gundîya saz bûye, heta niha jî di nav gundîya da merivên seqet hene, ku di dema xwe da derbên van hov û wehşa xwerine.

Xênji derebegên xelqê, kurd ji alîyê beg û milkedarên "xwe" da jî dihatine zêrandinê. Gundîyên kurd di bin du derba da bûn.

Ev cûrê jîyanê milet kiribû du beşa: alîyek beg û zordestên mayîn yên dewlemend bûn, alîyek jî gundîyên belengaz bûn û şerê çînî di navbera wan da di şertên eşîretîyê da dibûn.

Li wan hemû gundên kurda da, ku em lê qesidîn, di nav gundîyan da femdarîya rizgarbûna ji bin nîrê zordarîyê xurttir bûbû, hêrs û eynata wan ya hindava derebega û zordesta bi deha sala berevî ser hev bûbû û niha, piştî ku şoreşa Oktobir li Azirbêcanê bi ser ketîye û girêdayî wê yekê ra, ku her tişt tê kirinê bona gund bi riya soîyalîstîyê pêşda herin, ew femdarî rengekî nû wergirtîye.

Gelek zehmet bû ku newekehevtîya jîyana aborî di her gundekî da dîyar bikin, ji ber ku dewlemendên gund bi her awayî dixwestin rewşê usa bidin xuyanîkirin, ku dest li hebûna wan nekeve û firsend bikeve wan ew vir şûnda jî kîsî gundîya dewlemend bibin. Û ew rewşa, ku V.Gûrko-Kryajîn di nivîsên xwe da tîne ber çeva, ji rastîyê gelekî dûr e.

Berî ku qeydê Sovêtîyê li Azirbêcanê testîq bûbû, di piranîya gunda da rewşa kûlaka (dewlemenda) ji ya gundîyên orte û feqîr lap cuda dibû. Gundî di hêla aborî da bin destê dewlemenda da bûn. Cûrê jîyana nû ev hemû gerekê ji bingehê va biguharta.

Berî Sovyêtê gelek malbet dewlemend bûbûn, hebûna wan ji nisletekê derbazî yeke mayîn dibû. Ji ber wê jî wana hewl dida, ku cûrê jîyana eşîrtîyê wek berê bimîne, ji bo bikaribin hebûna xwe di dest xwe da xwey bikin û zêde bikin. Eger em gotinên Êngêls hindava gundîyên Kurdistanê da bi kar bînin, emê binhêrin, ku "çîna desthilatdar bona efûkirina zêrandin û şêlandinên xwe, di hêla jîyana eşîrtîyê da ji çapê zêde zordarî li milet kirîye"**(4)**.

Wek ku me îdî destnîşan kirîye, ev yek ne hîştîye şerê çînî bi ciddî pêşda here û ji ber wê jî karê hukumdarîya dewlemenda û zordesta daye sivikkirinê.

Em hatine ser wê bawerîyê, ku di wan hemû gunda da, ku em çûnê, rîspîtî (ne rûspî) hetanî niha jî serdestîya dewlemendan e. Bawerîyên V.Gûrko-Kiryajîn derheqa wê yekê da, ku li Azirbêcanê "qedirgirtina rîsipîya di nav kurdên Êrîvanê da ne ji hebûna wan tê, lê ji tiştên mayîn e", û bi wê yekê ra tevayî jî ew dibêje, ku ya sereke ew e, çika merivê rîsipî çiqasî bi nav û deng e, zane ye, ji kîjan kokê û malbetê ye,- bi bingehê xwe va şaş e û ji bo rast qîmetkirina rola rîsipîya fikrên wî meriva dixalifînin.

Gerekê ji bo wê yekê guhdarîke taybetî daynine ser evê fikrê, ji ber ku rîspîtî hetanî niha jî ji holê ranebûye û ewê wî çaxî tam rabe, eger sîyaseta me ya nû bi ser keve.

Wan meriva ra aksakal (rîspî) tê gotin, yên ku dewlemend in, xwîna milet dixwin, wî dizêrînin. Ji wan meriva ra "qedirgir" jî dibêjin, û ji ber wê ye, ku hukumê wî li gund hetanî niha jî maye.

Me dikaribû bi deha nimûneyên usa banîyana, ku rastîya gotinên me bidana testîqkirinê, ku aksakal zordarê milet e.

Ji bo wê yekê em tenê nimûneyekê bînin.

Berî qeydê Sovêtîyê hebûna merivekî bi navê Samed Hecî-oxluyê ji malbeta Terallûya (Şahverdîler), ku li Mînkendê dima, ewqas bû:

25 hesp, 100 serî heywanên gir, 200 mî, 30-40 çêlek, 200-250 hêktar erd. Bilî vê, 30-40 çêlekên wî yên doşanî hebûn. Bavê wî, Hecî Welî Xudavêrdî hela di saxîya xwe da ji bo ku kal bûbû, serkarîkirina malhebûna sipartibû kurê xwe. Him bav, him jî kur rîspî bûn. Xênji wê yekê, ku rîspîya şivan, xulam-xizmetkarên xwe dizêrandin, ser da jî zor didane wan, ku xizmetî temamîya malbetê bikin.

Zordestîyeke mayîn jî hebû. Rîspî dikaribû pera bi deynî bide merivên malbetê, lê hîç cara ne dida merivên ji eşîreke mayîn. Gundîyên feqîr ji dest tunebûnê da dizêrîyan.

Tiştekî balkêş e, ku fûnksîyonên cendirmîyê jî di dest rîspîya da bûn. Ew dikirine yûzbaşî û gundî ji dest wê yekê jî dihatine zêrandinê.

Eger di malekê da du rîspî hebûna û bixwestana yekî tenê hilbijartina, ew yek hildidane ser hesêb, ka çiqas hebûna wî heye, fûnksîyonên cendirmîyê di dest ji wan kîjanî da ne (wek nimûne, kî ji wan yûzbaşî ye). Nimûneke usa berê me di navça Laaçînê da dîtibû, di gundê Mînkendê da.

Rîspîtî - ew aleteke ku destûrê dide bin perda erf-edetên miletîyê da gel bizêrînin. Carna melle jî dikaribû bûbûya rîsipî, eger ew ji malbeteke dewlemend bû. Piranîya wan xwendina xwe ya ruhanî (olî) li Farizistanê distendin bona pişt ra bikaribin miletê feqîr bixapînin. Rîspîyên çend gunda melle bûn. Yek ji wan li gundê Axcekendê bû, li navça Laçînê. Mellê wira xênji fûnksîyonên melletîyê (yên dîndarîyê), yên rîspîtîyê jî dikir. Û gundên usa dîsa hene.

Femdarîye, ku di van şerta da, berî dîwana Sovêtîyê binecî mecbûr bûn bona peydakirina nanê zikê xwe, him bal milkedar û dewlemendên "xwe", him jî bal yên "xelqê" her karî bikin, heta xulamtî jî. Di dema zivistanê da piranîya kurdên gunda karê usa dikirin. Dema ew ji gund derdiketin û diçûne warên mayîn bona kar peyda bikin, fikreke usa peyda dibû, ku ew kurd di demsalên mayîn li zozanan in, ango koçer in, dû ra jî karên mayîn dikin. Ji ber wê jî hinek lêkolîner ser wê bawerîyê ne, ku piranîya kurdên navçeyên Laçînê û Kelbecarê koçer in. Kurd bona kar berê xwe didane Axdemê, Berdûyê, Axcebadê, bal gundîyên dewlemend karê gîhadirûnê, nandirûnê, berevkirina pembu dikirin, li ser karê çêkirina riya dixebitîn, dibûne hembal û h.w.d.

Em rastî gelek belengazên usa hatin. Hinek ji wana eva bîst salî zêdetir e, ku karê usa dikin. Di gundê Bozluyê, navça Laçînê da me bi gundîkî ra sohbet kir, ku 35 sala zivistana ji mal derketîye û ji bo kar çûye cîyên mayîn.

Di nav binecîyên mayîn da, tenê yên gelek dewlemend, ku xwedî gelek serî dewaran in, zivistana ji dest sermê bi dewarên xwe ra tevayî ji warên çiyayî dadikevine rasta. Lê yên usa pir hindik in, heta di wan gunda da jî, ku heywanxwedîlkirin karê wan yê sereke ye.

Em dijî bawerîyên V.Gûrko-Kryajîn in û ser wê fikrê ne, ku "koçerîya" zivistanê ji dest feqîrîyê bû, dema milet ji çîya berjêr dibû deşt û rasta û ebûra gundîya bi wê yekê va girêdayî bû, çika filan salê ekin çawan e. Bi gotina gundîya, wana ew kar ji neçarîyê dikir, ku ji birçîna nemirin.

Di ser van hemû tişta ra lazim e bê zêdekirinê, ku di wan navça da, ku me lêkolîn li ser wan kirine, gundî ne wekehev malên xwe dihîştin û ji bo peydakirina kar diçûne warên mayîn. Ew bi şertên her gundekî va girêdayî bû: di gundên paşketî da çûyîn pirtir bû, yên mayîn da hinekî ji wan kêmtir bû.

Bi wê yekê ra girêdayî em çend malûtaîya bînin (sala 1930î):

Di navça Laçînê da

Gundê Zêrtîyê: ji 42 mala 32 mal çûne

Gundê Mînkendê: ji 270 mala 50 mal

Gundê Bozlûyê: ji 71 mala 3-4 mal

Gundê Qeleçê: ji 16 mala 5 mal

Gundê Çênlanliyê: ji 65 mala heta 20 mal.

Di navça Kelbecarê da

Gundê Şûrtanê: ji 70 mala 5-10 mal

Gundê Soyuz-bûlaxê: ji 41 mala 3-7 mal

Gundê Zeylikê: ji 119 mala 7-8 mal.

Ji vê navnîşa me anî xuya dibe, ku ser her malekê hesibandî (bi selefa, ango prosênta) pirtir ji gundê Zêrtîyê, navça Laçînê çûne. Û ev tiştekî text-bext (tesedûf) nîne. Ew gund di navçeyên Laçînê û Kelbecarê da gundê herî feqîr bû. Perçekî binecîyên wî hetanî niha jî di holik û şikefta da dimînin. Ev gundê ku ji riya û dirba dûr e û pişt guha va hatîye avîtin, jîyana wan kurda tîne ber çevan, ku berî 2.500 sala Ksênofon di pirtûka xwe da derheqa wan da nivîsîye.

Lê gelek gund jî hene, ku neferên tu malekê zivistana ji gund dernayên an jî qet dernayên. Ji bo nimûnê, gundên Axcekendê, Kerekeşîşê û yên mayîn.

Wek me gotibû, pir kêm merivên dewlemend zivistana ji gund dertên, diçine rasta. Wek mînak, ji gundê Mînkendê ji her 50 mala tenê 2 mal bi heywanên xwe ra tevayî diçine deştê. Herdu mal jî dewlemend in. Em wê jî bêjin, ku ji navça Laçînê diha zef mal diçin, ne ku ji navça Kelbecarê û wan herdu navça da jî karê gundîya yê sereke heywanxwedîkirin e. Ev hemû careke mayîn dide îzbatkirin, ku ew gotina "kurd hemî koçer in" bi bingehê xwe va şaş e.

Di nav kurdên herêma Naxçiwanê da jî hinek mal zivistana bona peydakirina xebatê ji gundên xwe yên çiyayî dertên, diçine arana, lê jimara wan ji jimara kurdên usa yên navçeyên Laçînê û Kelbecarê gelekî kêmtir e. Ew bi wê yekê va tê şirovekirinê, ku di herêma Naxçiwanê da piranîya kurda di navça Stalîn da (Şarûra berê) dijîn û jîyaneke nîvkoçerîyê derbaz dikin, piranîya merivên feqîr bal dewlemend û milkedarên "xwe" dixebitin, û rewşa wan wek rewşa qûlan e (hêsîr). Ew zordestî carna dibe sebeb, ku hinek kurdên belengaz warên xwe dihêlin û diçin gundên turka yên cînar da bi cî dibin. Li vira meaşê xulama diha zêde ye, ne ku gundên wan da. Wek mînak, li gundê Sederekê, ku serhevdu çend kîlomêtra dûrî

Erezdeyanê ye, her sal weke 20 kurd wek hêsîr kar dikin û piranî jî havînê, di dema berevkirina ekin da. Lê çend gundîyên belengaz yên ji gundê Sederekê, ku turk in, havîna bal kurdên dewlemend karê gîhadirûnê dikin. Bi vî awayî, çûyîna kurda ji malên xwe ne ji wê ye, ku ew nikarin di gundê xwe da kar bibînin, lê ji wê ye, ku ew ji alîyê dewlemend û derebegên xwe da têne zêrandinê.

1. **S.A.Yêgîyazarov, rûpel 18.**
2. **S.A.Yêgîyazarov, rûpel 20.**
3. **K.Marks, *Kapîtal*, cilde 1, rûpel 47, Weşanxana "Prolêtarîy", sal 1923.**
4. **F.Êngêls, *Proîsxojdênîyê sêmyî, çastnoy sobstvênnostî î gosûdarstvo.* Weşanxana Pêtrogradskogo Sovêta R. î K. D., Pêtrograd, sal 1919, rûpel 38.**

Pêwendîyên eşîrtîyê û pêvajoya sosîyalîstîyê

Lêkolînên li navçeyên Laçînê û Kelbecarê didine xuyanîkirin, ku ew fikir şaş e, ku kurdên van navça bi cûrê eşîrtîyê dijîn. Em wek V.Gûrko Kryajîn nafikirin û ser wê bawerîyê ne, ku derbazbûna ser cûrê jîyana riatî, dema ku xwelî di dest milet da ne, piştî hatina qeydê Sovêtîyê guhêrîna xwefemdarîya gundîya, ku rengê şerkarîya çînî wergirtîye, alî wê yekê kirin, ku gundî ji jîyana bindestîyê derkevine ser riya pêşketinê, bibine xweyê keda xwe ya helal. Sazbûna kolxozan (malhebûnên kolêktîv), testîqbûna dîwana Sovêtîyê li gunda, tesîra partîyê li ser wan, alî pêşketina sosîyalîzmê dikin, ku berê çînên desthilatdar serketina ewê pêvajoyê ji bo berjewendîyên xwe berbend dikirin.

Em bi hûrgilî li ser rola rîspîtîyê li Kurdistanê sekinîn. Tiştekî nêzîkî aqilan e, ku paşmayînên (bermayînên) ewî cûrê jîyana eşîrtîyê heta niha jî mane, lê rîsipîtî niha jî li ser riya çêkirina sosîyalîzmê li gundên kurda astengeke bi xeter e. Femdarî ye, ku şerkarîya gundîyên belengaz û yên orte bona sazkirin û pêşdabirina kolxoza tiştekî ne hêsa ye û ji bo wê yekê gerekê bikaribin di şerê çînî da biserkevin, zora dewlemend û rîspîyên, ku heta niha gundî zêrandibûn, bibin. Em ser wê bawerîyê

ne, ku gerekê reng û rûyê wan milkedar û zordesta derxine ser avê, gerekê ew bi heqî bêne rûreşkirinê, ku bikaribin pêşdaçûyîna xwe kefîl (garantî) bikin. Eger usa nebe, perçekî miletê ku dihate zêrandinê, wê dîsa bide dû wan, bi a wan bike.

Ji ber wê jî çêkirina kolxoza di van navça da hêdî-hêdî pêş dikeve, xwesma di nav kurdên navça Kelbecarê da.

Em bala xwe bidne navça Laçînê:

Gorî salixên Komîtêya şuxulkirinê ya Laçînê, ku malûmatîyên komîtêya partîyê ya navçê jî ew yek testîq dike, hetanî 15ê tebaxê sala 1931ê tenê 26 selefê (%) gundên navçê bûne kolxoz. Em wê jî bêjin, ku di navçeyên Azirbêcanê yên mayîn da, ku pembu nayê bêcerkirinê, heta wê dema jorê kivşkirî jimara gundên, ku bûne kolxoz, 41,3 selef e. Ev jî hindik e, lê ew yek di gundên kurda da hindiktir e.

Dema xebata êkspêdîsyonê bêlî bû, ku di navça Laçînê da 11 gundên kurda hene: 1. Zêrtî, 2. Mînkend, 3. Bozlu, 4. Kemalli, 5. Keleçe, 6. Çeraxli, 7. Axcekend, 8. Kerekeşîş, 9. Ag-Bûlax, 10. Şêylanli û 11. du gundên rex Şênlanliyê yên biçûk: Katos-bîn û Çaybîn, ku hema bêje hemû jî bi hevdu ra girêdayîne.

Em li jêr malûmatîyên derheqa çêkirina kolxoza di gundên navça Laçînê da tînin:

.....

Bi vî awayî, ji 784 malhebûnên kurda yên navça Laçînê, ku di 11 gunda da hene, 2 kolxoz in bi 116 malhebûna va û di 3 gunda da jî 3 TOZ hene, ku 98 malhebûn tê da hene (ji 183 malhebûnên wan gunda).

Çêkirina kolxoza li navça Kelbecarê da gelek paş e. Rast e, em wê jî bêjin, ku karê çêkirina kolxozên heywanxwedîkirinê karekî dijwar e. Ji ber wê jî heta 1ê îlonê sala 1931ê di wê navçê da tenê 7,1 selefê gunda bûbûne kolxoz.

Gorî salixên êkspêdîsyonê di navça Kelbecarê da 6 gundên kurda hene: 1. Soyux-Bûlax, 2. Şûrtan, 3. Zeylik, 4. Axcekend, 5. Orûclu û 6. Xelanli.

Ji wana tenê gundê Axcekendê da kolxoz heye. Ew yek ji vê navnîşa jêrin xuya dibe:

Navên gunda	Jimara malhebûna	Ji wana bûne kolxoz
1. Soyûx-Bûlax	41	-
2. Şûrtan	70	-
3. Zeylik	119	-
4. Axcekend	88	29
5. Oruclu	58	-
6. Xalenli	56	-
Serhevdu	432	29

Bi vî awayî, ji 432 malhebûnên (malên) kurda tenê 29 dikevine nava kolxoza û ser her malekê hesabkirî ew yek di gundên kurda da kêmtir e û bêy wê jî bi tevayî li navça Kelbecarê da kêm e.

Wek me got, cûrê jîyana eşîrîyê hetanî niha jî bal kurda maye, ji ber ku xebata partîyê û sovêtîyê di wan navça da sist e, ew li ser riya bi cûrê sosîyalîstîyê daçêkirina gundên kurda dibine asteng, karê şerkarîya dijî milkedara û dewlemenda didine dijwarkirinê, ji ber ku zordar hetanî niha jî xwe bin perda edetên miletîyê vedişêrin û karê xwe wek berê dimeşînin. Me bala xwe da rewşa wan navça ya îroyîn û vanê me çi dît û texmîn kir:

Li gundê Mînkendê, navça Laçînê, 18 gundîyên dewlemend, ku baca xwe didan û ji ber wê jî nediketine di nava kolxoza, hukumî li ser merivên xwe kiribûn (bira, birazîya, xwerzîya û yên mayîn), ku ew jî (di nav wan da jî merivên feqîr hebûn) nekevine nava kolxoza. Ewana di karê xwe da bi ser ketibûn. Heta van demên dawî jî gelek gundîyên Terullûyê, Zalikliyê û yên mayîn nediketine nava kolxoza. Heta di gundê Mînkendê jî, ku li wir karê kolxozê baş dimeşe, jimara kolxozvana kêm e. Wek me li jorê dabû xuyakirin, ji 270 malhebûna tenê 66 diketine nava kolxoza. Em wê jî bêjin, ku berê kolxoz du cara ji hev çûbû û tenê van axirîya xwe girtîye.

Di civîneke komsomola û endamên partîyê da merivên belengaz, wek mînak ji gundê Terelluyê, digotin, ku bira filan apê wan bikeve kolxozê, ewê jî bikevinê. Di navça Kelbecarê da, ku cûrê jîyana eşîrtîyê ji Laçînê zêdetir mabû, ser her malekê hesabkirî, kolxoz hindiktir bûn.

Di navça Stalîn (Şarûra berê), herêma Naxçiwanê da, li ku piranîya kurdên herêma Naxçiwanê lê dimînin, di gundên kurda da tu kolxozek tune. Bi bawerîya me, ev yek ne tiştekî tesedûf e. Em bawer nakin, ku di navçeke din ya Azirbêcanê da hukumê eşîrtîyê usa xurt maye, wek ku ew di nav kurdên Naxçiwanê da ye. Koçerîya kurdên Naxçiwanê alî wê yekê dike. Eşîrtî ne tenê di hundurê malbetê da roleke xirab dilîze, lê ji sînorê wê der, di pêwendîyên bi malbetên mayîn ra jî. Vira gilî ne tenê derheqa wê yekê da ne, çika tu ji kîjan eşîrê yî û çiqasî li ser erf-edetên kal û bava mayî, wek ku ew yek li navçeyên Laçînê û Kelbecarê da ne. Niha usa bûye, ku tenê kal û pîr xwe berk li jîyana eşîrtîyê digirin, lê gelek gencên ku em rastî wan hatin, ewqasî jî guh nadine wê yekê. Di her gundekî da 2, 3, 5, 7 û zêdetir qebîl hene. Vira eşîrî ser her tiştî ra ne. Em wê jî bêjin, gava ku di navça Laçînê da em çûne gundê Keleçê, ku nêzîkî Mînkendê ye, me dît ku li wir hemû merivên hev in û ji eşîrekê ne. Ji ber wê jî di van şertan da pir dijwar e kolxozên bi hêz saz bikin, lê ne yên bi nav, bi dewlemend û zordara ra şerkarîyê bikin. Lê ew dijwarîyên usane, ku merî dikare çareser bike. Ji bo vê yekê gerekê rêxistinên partîyê û Sovêtîyê di nav wan da karekî ciddî bikin. Lê rêxistinên usa li wan cîya da ne gelekî xurt in.

Lê gundê wek Keleçê di navçeyên Laçînê û Kelbecarê da tunene. Lê di nav kurdên herêma Naxçiwanê da hene û pir in jî. Em bidne kivşkirinê, ku gundên kurda, ku rex hêwirgeha (station) Erezdeyan in, warên eşîran e, ku navê eşîra xwe li gundên

xwe kirine û navê her gundekî vira yê resmî zûda heye, lê gundî bi kar naynin. Serhevdu li vê navçê da 7 gundên kurda hene: 1. Kere-Burun, 2. Yanix, 3. Korkmaz, 4. Gelewan, 5. Mehmûd-kend, 6. Vodokaçka û 7. Kixaç. Lê ev nav gelek cara nayêne bikaranînê, lê wek me got, navê eşîrên xwe li gunda kirine û usa jî bi nav dikin.

Gorî wê yekê navê Şawlikî danîne li ser gundên Kara Bûrûn û Yanix; bi wî awayî navê Korkmas danîne li ser gundê Banûkî; navê Herikî li gundên Gelewan, Mehmûd Kend û Vodokaçka kirine, ji ber ku eşîra Herika lê dimînin; navê eşîra Beşkîya li gundê Kixacê kirine. Wek me îdî gotîye, ev hemû gund cînarên gundên turka yên navça Sederekê ne, ku çend gundên biçûk di nav da hene û ew dikevine li ser sînorê xeta riya hesin ya ji Cûlfa-Bekûyê destpêkirî hetanî tê digihîje çemê Erez, ku ew jî sînorê Yekîtîya Sovyêt e bi Tirkîyê û Farizistanê ra. Beraya wî sînorî 5-7 kîlomêtr e, dirêjaya wî 10-12 kîlomêtr e. Hemû gundên kurda, ku me navê wan dane rêzê, diketine di nav şêwra gundekî da, ku navê Şawlika lê kiribûn û ew jî dikete nava navçeke serbixwe - navça Stalîn (ew berî salekê bûbû navçe), ya herêma Naxçiwanê. Wek ku emê li jêr bidne xuyanîkirin, di şertên ku welêt da sosîyalîzm dihate çêkirinê, ew nav ne lê ne dihat. Ji ber ku piranîya kurdên ewê navçê ji eşîra Şawlika nîbûn.

Gorî salixên, ku me ji komîtêya navça Stalîn sitendibû, jimara binecîyên gundên kurda bi hesabê 5ê îlonê sala 1931a aha bû:

Navê gund an jî eşîrê	Jimara mala	Jimara binecîya
Şawlikî.....	54	315
Yanix.....	57	264
Gelewan.....	87	383
Korkmas.....	26	135
Beşkî.....	60	410
	---	---
Serhevdu	284	1507

Di vê navnîşê da hinek gund bi navê eşîrê ne, hinek jî - na. Wek mînak, navê gundekî Şawlikî ye, ku ji navê eşîra Şewlika tê, navê gundekî mayîn jî Yanix e, ku li wir jî eşîra Şawlika dimînin; Gelewan û Korkmas ew gund in, ku eşîra Herkî lê dimîne, lê gundê Kixaç carna tê binavkirinê Kixaç, carna jî ew bi navê eşîrê - bi navê Beşkî tê binavkirinê.

Gorî van malûmatîyan, usa jî ew yek, ku em bidne ber çeva çika hebûna eşîra Şawlika çiqas e, ku li gundên Kara-Bûrûmê û Yanixê diman, herweha hebûna eşîrên mayîn jî, em bêjin ya Beşkîya, ku li gundê Kixac dima, jimareke awa dertê:

Hebûna eşîra Şawlika, ku li du gunda da dimîne, haqas e:

Heywanên gir Hesp Mî Guhdirêj

Kara-Bûrûnê.....	223	57	1814	9
Yanixê.....	315	55	2480	5
Serhevdu:	538	112	4294	14

Hebûna eşîra Beşkîya, ku li gundê Kixacê dimîne, haqas e:

Heywanên gir	Hesp	Mî	Guhdirêj
346	43	798	5

Eşîra Şawlika ji 579 merîyan e, lê ya Beşkîya - 410. Lê di navbera hebûna wan da ferqek mezin heye, ew jî wê demê, ku di qewlên wan yên jîyanê da ferq tune. Ew gund çend kîlomêtra dûrî hev in.

Malûmatîyên himberîhevkirinê didine xuyanîkirin, ku eşîra Şawlika di hêla aborî da ji eşîrên mayîn dewlemendtir in, di nav wan da ji Beşkîya jî.

Ango, tiştekî dijwar nîne texmîn bikin, ku vira gilî ne di eşîrê da ne, lê di hêza hukumdar da ne (milkedar û dewlemenda), ku piranîya hebûna gundîya di dest wan da ne. Jîyana cûrê eşîrtîyê, ku kokbir ne bûye, dibe sebebê wê yekê, ku hukumê milkedar û dewlemenda hetanî niha jî maye, ku li herêma Naxçiwanê jî navê "rîspî" li wan kirine. Di nav eşîra da kîjan ji wana xurt e (em bêjin, di nav Şawlika û Beşkîya), hukumê wî li ser hemû eşîra derbaz dibe.

Merî dikare bi hêsanî fêm bike, ku çima eşîra Şawlika di van şerta da diha xurt e û hukumê wê ne tenê ser mirîdên eşîra xwe, lê ser yên mayîn jî derbaz dibe. Di wî karî da rêxistinên me yên Sovêtîyê jî şaşî berdan, dema navê Şawlikî li şêwra gund kirin, ku çend gundên mayîn jî dikevine navê.

Em derbazî alîyekî jîyana eşîrtîyê bibin - heyfhildana xwînê.

Heyfhildana xwînî di navçeyên Laçînê û Kelbecarê da hema bêje nemaye. Di nav van 10-15 salên dawî di nav van navça da hevkuştin pir nebûne. Lê ew yek di nav kurdên herêma Naxçiwanê da heta niha jî heye û taybetîyek jî ew e, ku di nav wan da yên êrîşkar û parastvan hene. Yên ku êrîş dibine ser xelqê, piranîya wan ew merîne, ku rewşa wan ya aborî baş e, ew dewlemend in. Rast e, di nav kurdên Naxçiwanê da şerkarîya çînî destpê bûye, lê pir hêdî pêşda diçe, di hêlekê da jî tesîra partîyê li ser wan zêde dibe, lê dîsa jî heyfhildana xwînî ji holê ranabe.

Wek ku em pê hesiyan, ji berê da di nav eşîrên Şawlika û Beşkîya dijminayîk heye. Hetanî niha jî ji malbeta Beşkîya merî têne kuştinê. Di hezîrana sala 1931ê Şawlikîya gundîkî feqîr kuştin. Hema bêje di wan dema da wana palekî turka birîndar kirin. Tu şik tune, ku ew kuştin (me nikaribû em hûrgilîyên wan pê bihesin) bi destî milkedarên ji malbeta Şawlika têne teşkîlkirinê. Û wek berê rîspîyên kurda herdu eşîr li hev dianîn, diketine navbera merivên merivkuj û yên kuştî. Lê ew rîspî di şertên nû da îdî rengê xwe guhartibûn û perdekî nû danîbûne ber çevê xwe.

Gerekê bê kivşkirinê, ku xwesma li herêma Naxçiwanê, hinek cara jî li navçeyên Laçînê û Kelbecarê, hetanî niha jî hukumê rîspîyan li ser milet heye, heta li ser jîyana jin û mêrê ya tevayî da jî. Milet ji bo pirsên ku li hev nakin, ji bo zewacê, hevberdanê û kêmasîyên di nav jîyana rojane da, bedbextîya, hucetên li ser xwelîyê, pevçûna, dizî û talanê, buxdankarîyê û şerletanîyê ji bo şêwr û temîya berê xwe didine rîspîya, bona ew wan pirsa çareser bikin.

Bi vê yekê va girêdayî di karê pêşîgirtin û kokbirkirina rola rîspîya da dijwarîyên mezin radibine holê. Tiştekî femdarî ye, ku jîyana bi cûrê eşîrtîyê çiqasî xurt be, diha dijwar e dijî wê şer bikî, çiqas tesîra erf-edetên kevin yên ziyandar pir be, ku bi saya serê wê yekê jî milkedar xwe ser piya digirin, diha zehmet e derkevî himberî wê.

Em di wê yekê da hatine bawerkirinê, dema me li herêma Naxçiwanê lêkolîn derbaz dikirin li ser hukumê eşîrtîyê li wan navça da. Em wê jî bêjin, ku ew hukum li navçeyên Azirbêcanê yên Laçînê û Kelbecarê kêmtir e. Pêwendîyên eşîrtîyê û malbetîyê di hêlekê da, nerazîbûnên çînî jî di hêlekê da, bûne bela serê milet.

Di van şerta da terefdarên jîyana eşîrtîyê bi her awayî dertêne dijî xebata rêxistinên sovêtîyê û partîyê di nav navça da û bi wê yekê va karê çêkirina sosîyalîstîyê, bilindkirina dereca jîyana feqîr û belengazên kurd berbend dikin.

Me texmîn dikir, ku di van şerta da xebata rêxistinên sovêtîyê û partîyê di nav gel da gerekê çend qat bê zêdekirinê, lê rola wan sist e û ne gorî pirsdanînên jîyana bi cûrê nû ne. Berî her tiştî, gundîyên feqîr û belengaz ne bi hevra nin, di nav wan da yekîtîyeke berbiçev tune, ku bi tevayî derkevine himberî milkedar û zordesta, çêkirina kolxoza di gundên kurda da (himberî gundên, ku ne yên kurdan e) wek ku lazim e, pêşda naçe, di nav kurdan da karê partîyê sist e û hela zîlên xwe jî nedane. Di nav kurda da tek-tûk komûnîst hene, komsomol jî di nav genca da karê ku danîne pêş wan, nake. Kolxoz û sovxozên heyî jî têrê nakin, ku gundên kurda serdestîyên wan texmîn bikin.

Di nav sovxozên wan navçeyan da, ku me lêkolîn li ser wan kirine, bi taybetî jî li sovxoza pezxwedîkirinê "Ovsêvod" da, ew pirsdanîn pêk naynin, ku bi biryara Komîtêya Navbendî ya PK Yekîtîya Sovyêt û Şêwra Komîsarên Gelî ya PKYS bi bangawazîya xwe ya meha tîrmehê sala 1931ê ya derheqa bi cûrê sosîyalîstîyê pêşdabirina heywanxwedîkirinê da danîne ser wan.

Sovxozên heywanxwedîkirinê gerekê ji bo kolxoz û malhebûnên gundîya yên arizî bûbûna nimûna çevdayînê, ku çawa dikarin malhebûna sosîyalîstîyê pêşda bibin, têknîka nû bi kar bînin, çawa xebatê bi cûrê nû teşkîl bikin.

Sovxoza mezin "Ovsêvod" ("Heywanxwedîkir"), ku li navça Kelbecarê da hemû mehên havînê da heywan xwedî dike, û sovxozên heywanxwedîkirinê yên ku di navçeyên kurda yên herêma Naxçiwanê da hene û ew jî dikevine nava "Ovsêvodê", ji merkeza navça lap hatine birînê, jîyanake wek ya eşîrîyê derbaz dikin û wek dibêjin, haya wan ji bayê dinyayê tune.

Di navbera kolxoza gundê Sederekê û gundên kurdan yên cînar da, tu pêwendî tunene. Di herêma Naxçiwanê da jî usan e. Sovxoza mezin ya ser navê Bûnyat Zadê, ku cînara gundê kurdan e, bi kurda ra tu pêwendî danenîye.

Lê dîsa jî, şerkarîya ji bo sazkirina kolxoza û bi cûrê sosîyalîstîyê guhastina jîyana gundîya karê gundî û xebatkarên kurd û turk yê sereke ye. Wana di hêlekê da hewl didan ji bindestîya milkedarên "xwe" û yên "xelqê" aza bin, gundîyên belengaz ji bin tesîra jîyana eşîrtîyê derxin, di hêlekê da jî wana her tişt dikir bona di şerê çînî da bi ser kevin û bikevine ser riya pêşdaçûyînê û halxweşîyê.

Rast e, kolxozên di navçeyên Kurdistana berê da sist bûn, ji ber ku nû saz bûbûn, lê gundîya bi awakî zelal texmîn dikir, ku ev cûrê jîyanê ji ya berê pêşketîtir e, û dema ku gund bi bingehê xwe va bê guhastinê û bikeve ser riya sosîyalîstîyê, ewana dikarin rewşa xwe ya aborî gelekî bidne xweşkirinê û ji rewşa berê ya nemir-nejî, dema gundî ne xwedîyê keda xwe ya helal bû, derkevin û ji bindestîyê û zêrandinê jî xilas bin.

Bi mîlyona gundîyên xebatkar yên tevaya Sovyêtê bawerîya xwe bi vî cûrê jîyana nû dianîn: ewana dengê xwe didin bona gund bibine kolxoz, ji ber ku ewê wana ji zordestî û destdirêjayên milkedara û dewlemenda rizgar bike.

Em çima awa bi hûrgilî li ser nimûna çêkirina kolxoza di navçeyên Kurdistana berê da sekinîn. Ji ber ku di wê nivîsa biçûk da, ku di dema Sovyêtê da - sala 1928a - çap bûbû, derheqa kurdên Azirbêcanê da tiştên ewqas şaş hebûn, ku me deynê xwe hesiband rastîya wan raberî we bikin. Eger me usa nekira, emê ber xebatkarên kurd gunehkar derketana.

Em binhêrin, ku "lêkolînerekî" kurdên Azirbêcanê V.M.Sîsoyev sala 1928a derheqa seredana xwe ya li gundê Mîrîkê, navça Laçînê çi gotîye:

"Merivê, ku em li Mîrîkê li mala wî bûne mêvan, kurdekî dewlemend bû; heta semawira wî jî ji hesinê giranbuha bû. Him malxwê malê, him jî xanima wî, ku ew jî kurd bû, merivên guhdar, berbihêr û maqûl bûn: her tiştên wan paqij û lihevhatî bûn. Malxwêya malê xwerineke xweş ji me ra çê kir; mirîşkek di rûn da qeland û ji pelên tirîya "dolme" pêçan û h.w.d; bi çayê ra "doşebeke" (dims) xweş dan. Usa xuya ye, ku eger meriv kar bike, hinekî jî zor bide hişê xwe, heta di şikevtên Kurdistanê da jî dikare baş bijî; lê hetanî niha jî hema bêje nîvê binecîya bi jîyana berî hezar sala va dijî"(1).

Gelo hewcedarî heye em îzbat bikin, ku ev gotin wek gotinên wan dijminên çînî ne, ku ewana derheqa dewlemenda da gotine, ku ew xudêgiravî dikarin malhebûnê "bi aqilane" pêşda bibin. Û gelek gundîyên feqîr jî bawerîya xwe bi van gotinên derew tînin. Em wê jî bêjin, ku pirtûka V.M.Sîsoyev sala 1928a ji alîyê weşanxana Azkomstar da çap bûye, lê li ser belgê pêşin nivîsar e: "Komîsarîyata Perwerdeya Gelî ya KSS Azirbêcanê", û ev derewa hinkûfî milkedara heta niha jî nehatîye belûkirinê.

Lê em carek din vegerine ser karê çêkirina kolxoza li Kurdistanê, ku jîyana gelê kurd gerekê berbi başîyê biguhêrîne.

Ji bo wê yekê em bala xwe bidne wan salixan, ku derheqa wê yekê da bin destê me da hene û bi vê yekê ra girêdayî jî gotinên Stalîn bîr bînin, ku "kolxoz riya tek-tenê ye, ku dikare gundîya ji bin bindestîyê derîne".

Em bidne kivşkirinê, ku piştî kolxoz hatine çêkirinê, jimara wan kesan, ku di mehên zivistanê da malên xwe dihîştin û dadiketine deşt û arana, gelek kêm bûye, lê li hinek kolxoza da (wek mînak. li Mînkendê) ew "koçerîya demkurt" lap (hîç) ne maye.

Teşkîlkirin û parevekirina xebatê di hundurê kolxozê da gundîya ji karên ne kardar û ne kêrhatî xilaz dike, xwesma dema di malhebûna heywanxwedîkirinê da dixebitî. Di dema êkspêdîsyonê me gelek cara ji zarê kolxozvana bihîstîye, ku ev cûrê kar bi dilê wan e. Jîyana di kolxozê da dide îzbatkirin, ku gotinên awa ne bê bingeh in.

Niha em bala xwe bidne rewşa kolxozekê, ku li gundê Mînkendê, navça Laçînê da ne. Kolxoza ser navê Karl Marks da du milet hene: ji 66 malhebûna - 40 malên kurdan e û 26 jî yên turkan e. Kolxoz bi heywanxwedîkirinê û çandinîya nên va mijûl dibe. Em çûne zozanên wê, ku 4 kîlomêtra dûrî gund e. Temamîya heywanên kolxozê li wir bûn: 96 boxe, 55 çêlek, 192 mî, 18 hêştir, 40 hesp û 22 guhdirêj (ker). 17 merî xizmetî zozana dikirin. 9 jin bûn, 8 jî mêr bûn, lê piranîya endamên kolxozê li gund mabûn û karê deştê dikirin. Heta ji wergirtina (xwekirina cilên wan) kolxozvana ya paqij û delal, dem û dezgên kar jî xuya bû, ku jîyan guhêrî ye, xweştir bûye. Di nav heywanxwedîkirinê da jî kar hatîye parevekirinê. Hinek kolxozvan miqatîyê li heywana dikin, çêleka didoşin. Hinekên din jî adanîya şîr jê diqetînin, jê rûn çê dikin û dikine toxavk. Xwerina kolxozvana jî ji ya xebatkarên malhebûnên mayîn baştir e.

Serokê perça heywanxwedîkirinê ya kolxoza Mînkendê kurd e, ku berê li Bekûyê pale bû û ew bi xebatkarên turk û kurd ra tevayî jîyana bi cûrê nû ya întêrnasyonalîstîyê û sosîyalîstîyê çê dike.

Kolxozên wek yên Mînkendê ya ser navê K.Marks dîsa hene. Û di nav wan da jî gelek xebatkarên ji Bekûyê hene, ku vegerîyane warên xwe.

Me dikaribû ev şirovekirina xwe berdewam bikira, an jî nimûneyên mayîn banîyana, lê mînakên me anîn jî têr dikin, ku merî serdestîya kolxoza himberî malhebûnên mayîn texmîn bike û evê yekê binecîyên wan navça jî dibînin.

Hilbet, her tişt bêqusûr nîne. Kolxozvan tam dest ji erf-edetên kevin yên ziyandar ne kişandine. Ew yek nikare tesîra xwe li ser hal û demên kolxozê nehêle (deranîntîya xebatê, parevekirina kar hundurê kolxozê da û h.w.d.), ew li ser riya zêdekirina jimara kolxoza jî dibine asteng.

Sazkirina kolxozên nû, xwesma yên heywanxwedîkirinê, gerekê li ser bingehê kolxozên heyî bêne çêkirinê, usa ku cêribandina yên heyî bal xwe jî bidne rikinkirinê, bona diha şênkirina jîyana gunda ya bi cûrê sosîyalîstîyê.

Bona serketina vî karê mezin gerekê prolêtarîyata Bekûyê bê hewara wan, alîkarîya wan bike. Ewana niha li her dera hene, heta cî û wargên Kurdistana berê û Naxçiwanê yên here paşketî da jî. Ewana hatine bona gundê xwe careke din çê bikin, nû bikin û bi riya sosîyalîstîyê pêşda bibin. Em wê jî bêjin, ku prolêtarîata Bekûyê ev armanc danîye pêşîya xwe, ku gundên Azirbêcanê şên bikin.

"Bajarê sosîyalîstîyê,- hevalê Stalîn di xeberdana xwe ya li konfêransa agrarnîkên Marksîst da gotîye,- gerekê gunda ji bingehê va biguhêre, di wan da kolxoza û sovxoza çê bike û wana bixe ser riya sosîyalîstîyê".

Bi têknîka nû pêşdabirina karên kolxoza û sovxoza, çêkirina rêyên baş, bilindkirina zoraya deranînê(2) - ev hemû ew şert in, ku bi saya serê wan di hemû gundên navça da gerekê kolxoz hebin û li ser wê bingehê jî wê milkedarî ji holê rabe, wê di navbera gund û bajarên Azirbêcanê da ferq nemîne.

Ev hemû barekî mezin datîne li ser milên rêxistinên partîyê û Sovêtîyê, ku gerekê dest ji têorîya berê ya genîbûyî û ya dijî Lênînîyê bikişînin û xwe li daxazên rojên îroyîn bigrin, û derheqa vê yekê da serekê partîyê di nav xeberdana xwe da got. Lê hetanî niha jî ew têorîya kevin di nav xebata wan rêxistina da kokbir ne bûye. Û îro, dema gelek gundîyên feqîr û orte gurra milkedarên berê dikin, tenê bi wê yekê va tê şirovekirinê. Hukumê rêxistinên partîyê û Sovêtîyê li ser gundîyên kurd ewqas bi hêz nîne, ku bikaribin gundîya ji tesîra derebeg û dewlemenda dûr bixin, di nav gundîya da xebata civakî-sîyasî wek ku tê xwestin, nayê kirinê. Ew jî di rûyê wê yekê da ne, ku hetanî van demên axirîyê jî ew pirsên sereke piş guhê xwe va hatibûn avîtin, ku gerekê femdarîya gundîya ji bingehê va bidana guhastin û berê wan bidana pêkanîna daxaz û armancên partîyê.

(1) V.M.Sîsoev. Kurdîstan. Laçîn. Arxêologîçêskîy oçêrk. Otd. ottîsk îz 3-go vipûska "Îzvêstîy Azkomstarîsa", Bakû, 1928. Narkompros "Azkomstarîs", str. 18.

(2) Li navçeyên herêma Kurdistana berê (xwesma yên Laçînê û Kelbecarê) da gelek medenên giranbuha hene: komir, sifir, pêmza, azbêst, xwelîya kaxçînê û h.w.d; li wir gelek "komirên sipî" hene (çemê Têrtêrê û çemên mayîn), kanîyên ava medenîyê yên qenckirinê hene (wek kanîya Îstî-Sûyê, ku rex wê havîngeheke bi wî navî hatîye çêkirinê, ku gelek nexweşîya qenc dike û di wî alî da ji ava Karlsbadê ya bi nav û deng danaxwe, ji wî ne kêmtir e). Lê di karê bi kardarî xebitandina dewlemndtîyên herêmê yên binerd û herweha havîngeha Îstî-Sûyê jî ji bo xebatkarên Azirbêcanê, Pişkavkazê û temamîya Yekîtîya Sovyêt, çend asteng hene û ji wan ya sereke jî ew e, ku gerekê bi lez riya çê bikin û pirsa çûyîn-hatinê çareser bikin.

Teşkîla Miletîyê

Em binhêrin çika jimara kurda, ku li ser axa Kurdistana Azirbêcanê dimînin, çiqas e.

Di vê pirsê da heta van demên dawî jî tevlihevîyeke usa heye, ku bi kurdên Azirbêcana Sovêtîyê ra girêdayî tu pirseke mayîn da tune. Şaşîyên mezin di vê pirsê da berê jî hebûn, dibe paşê jî hebin, eger wê pirsê zelal nekin.

Ji şikberîyê der e, ku bal me di karê hesabkirina binecîyan da kêmasîyên mezin hene û ev yek hetanî van demên dawî jî ji alîyê oportûnîstên rastê da hatine xebitandinê bona êrîş bibine li ser wê xeta partîyê, ku ewê di pirsa ji holê rakirina milkedara da danîye pêş xwe. Statîstîka dêmografîyê li Pişkavkazê, xwesma di wî perçeyî da, ku derheqa salixên miletên kêmjimar da ne, ku li ser axa komarên Pişkavkazê dimînin, dikule. Malûmatîyên derheqa vê yekê da carna dijî hev in, text-bext in (tesedûfî ne). Ji ber wê jî heta niha jimara kurdên Azirbêcanê ne bêlî ye.

V.Gûrko-Kryajîn, ku me li jor behsa wî kirîye, di nivîsên xwe da gelek cara li ser vê pirsê sekinîye. Ev perçê xebata wî hewaskar e, lê em wê jî bêjin, ku îzbatîyên wî ne her cara rast in û ewî nikaribûye tam bersîva derheqa jimara kurdên Azirbêcanê da bide, xwesma wan kurda, ku li ser axa Kurdistana berê dimînin, ku sala 1923a herêmeke otonom bû û heta sala 1929a bi wî navî hebû.

Berî her tiştî em ser wê bawerîyê ne, ku lazim e careke din vegerine ser vê pirsê û malûmatîyên bin destê me da jî gelek kêm in, yên ku me ji arşîvên dewletê derxistine (qesta me Arşîva Navbendî ya Komîsyona Hilbijartinê ya Navbedî ya Azirbêcanê da ne - KHNA).

Wek ku em ji hinek nivîsên nivîşkan û ne tam pê hesîyan, yên ku derheqa parevekirina Azirbêcanê bû li ser navça, ku sala 1923a destpê bûbû (me nikaribû ew hemû nivîs bidîtana, ku derheqa vê pirsê da bûn), pirsa derheqa herêma Kurdistanê da gelek cara him di KHNA û komîsyona bona sazkirina navça û him jî di rêxistinên partîyê da bûye têma minaqeşekirinê. Ji alîyê Komîtêya Navbendî ya PK Azirbêcanê da komîsyonek hatibû teşkîlkirinê bona kivşkirina sînorên Nagornîy Karabaxê (Qerebaxa Çiyayî) û Kurdistanê û çika cûrê otonomîya wan gerekê çawa be. Wek me texmîn kir, li bal komîsyonê şik tunebûye, ku lazime otonomîyê bidne Nagornîy Karabaxê, lê derheqa Kurdistanê da em wê yekê nikarin bêjin. Pirsa derheqa Kurdistanê da çend meha hatîye minaqeşekirinê, lê hindava herêma Kubetlîyê da, ku paşdemê da ew bû perçekî (ji 5 perça yek) axa Kurdistanê, serwêrtîya KHNAê çend biryar qebûl kirin û çend cara jî ew biryar hêç hesibandin. Di navbera mehên çirîya pêşin - çileya pêşin sala 1922a da sê biryarên Sedirtîya KHNAê derketin (21.10.22s. §4; 20.11.22s. §2; 30.12.22s. §4) derheqa herêma Kubetlîyê da û ji wana ya pêşin derheqa wê yekê da bû, ku ewê herêmê nexine nava axa Kurdistanê, lê bi du biryarên mayîn çareserkirina pirsê ser demekê paşda êxistin.

13ê çileya paşin sala 1923a Sedirtîya KHNAê careke din li ser wê pirsê sekinî û dîsa girêdayî teşkîlkirina otonomîya Kurdistanê ra herêma Kubetlîyê ji wê axê der ma. (§1, protokola Sedirtîya KHNAê)(1). Hetanî havîna sala 1923a pirsa derheqa qedera Kurdistanê da çend cara dikeve rojeva Komîsyona Navbendî ya KHNAê. Û di hezîrana sala 1923a da Komîsyona taybetî li ser wê pirsê disekine.

Bin destê me da du protokolên ewê Komîsyonê hene, ku Înstîtûta dîroka partîyê ya ser navê Şahûmyan ya rex Komîtêya Navbendî ya PK Azirbêcanê ji arşîva xwe daye me.

Di civata Komîsyonê ya pêşin da pirsa derheqa Kurdistanê usa hatibû danînê, çika cûrê serkarîkirina wê gerekê çawa be û sînorên wê gerekê ji ku heta kîderê bin. Ber destê me hûrgilîyên ewê civînê tunene. Lê têksta biryarê li bal me tu şikê nahêle, ku di pirsa derheqa Kurdistanê da bal endamên komîsyonê yekşivêtî tunebûye (hemfikir nîbûne), di hinek alîyan da ew lap dijî hev bûne û heta nehîştine ew pirs çareser jî bibe.

Di protokola civîna Komîsyonê da ew yek ha xuya dibe:

"§4. Du pêşnîyar hene: 1) Kurdistanê wek herêm bikine otonom, ku gerekê bin bandûra navbendê da be, û gerekê herêmên Cewanşîrê, Şûşîyê û Kubetlîyê bikevine nava wê. sebebên wê jî ev in: Kurdistan ji Bekûyê gelekî dûr e, Kurdistan ji Qerebaxa Jêrîn dûr e û jimara binecîyên wê dike weke 60 hezar merî. Sebebek jî ew e, ku navbendê hetanî niha guhdarîya taybetî ne danîye ser vê herêmê û daxazên wan yên rojane pêk ne anîne û ji bo wê yekê, ku hetanî niha ew bin bandûra herêma Qerebaxê da bûye. 2). Kurdistan mînanî berê wek navçeya bin bandûra Qerebaxa Jêrîn (ya deştî) bihêlin.

Di dengdayînê da deng weke hev derketin"(2). Em ser wê bawerîyê ne, ku gerekê usa jî bibûya, ji ber ku argûmêntên terefdarên dayîna otonomîyayê ji bo Kurdistanê ne xurt bûn. Wek ku em ji biryara civînê dibînin, îzbatîyên ku ew anîbûn, tenê derheqa axê da bûn û di wê pirsê da dikaribûn bi hêsanî derketana himberî terefdara.

Ji hev dûrbûna navçeyên ku gerekê biketana di nav Kurdistanê da û ji rûyê rêyên xirab da tunebûna pêwendîyan di navbera wan da mecbûr dikirin, ku wan navça bi serî xwe bihêlin, û ew yek jî dijî wê daxaza partîyê bû, ku ew herêmên ku bi çiya ji hev hatine qetandin, rêyên di navbera wan da jî ne baş in, bighînine hevdu û şên bikin. Eger em tenê mezîlên wan axa bidne ber çeva, wê demê daxaza ku wan navça bighînine hev, wê formalîte bûya û ewê ne gorî daxazên komîsyonê bibûya, ne jî gorî daxazên terefdarên otonomîya Kurdistanê bibûya. Lê daxaza terefdarên otonomîya Kurdistanê ya sereke ew bû, ku pêwendîyên wan bi navbenda Komara Sovêtîyê ya Sosîyalîstîyê ya Azirbêcanê, bi prolêtarîyata Bekûyê ra xurt bibin.

Me qestbende tenê derheqa şertên gêografî û tebîyetê da xeberda, ji ber ku, wek me îdî daye xuyanîkirin, argûmêntên mayîn yên ji bo otonomîyê bidne Kurdistanê, tunebûn; eger ew hebûn jî, sist bûn û bi ser ne ketin.

Di civîna ewê komîsyonê ya mayîn da, ku 7ê hezîranê sala 1923a hate derbazkirinê, ew kar bi bawerîya me nişkêva lap rengekî mayîn wergirt.

Em bala xwe bidnê çika di protokola wê ya duda da çi hatîye nivîsar:

Bihîstin: 2. Derheqa Kurdistanê da

Biryar kirin: Kurdistana Otonom saz bikin, navbend û sînorên wê wî çaxî kivş bikin, dema ku sînorên Otonomîya Nagornî Karabaxê bêne kivşkirinê.

Mixabin, me tu nivîs ne dîtin derheqa wê yekê da, çika pişt ra ew pirs çawa bû. Lê tiştek ji sedî sed e, ku rûyê wê yekê da, ku rêxistinên jordest ew biryar zû testîq

nekirin, ji ber wê jî ew ser demekê li ser kaxez ma. Lê dawî li hev kirin û Kurdistan bû herêmeke otonomî, sînorên wê usa hatine kivşkirinê, ku bi proêkta pêşin da hatibû pêşnîyarkirinê, ku me derheqa wê da li jorê gotîye.

Îdî di tebaxa sala 1923a da rehmetlêbûyîyê Husî Hecîyev hate kivşkirinê wek serekê herêma Kurdistanê. Di arşîvê da em rastî nivîsên derheqa hevraxeberdanên wî bi serokatîya Şêwra Komîsarên Gelî ya KSS Azirbêcanê ra hatin, ku bi pirsên herêma Kurdistanê ya nûsazbûyî ra girêdayî bûn. Di nav gel da ew herêm dihate binavkirinê wek "Kurdistan".

Em zanin, ku piranîya kurda ji dervayî welatê me dimînin, piranî jî li Farizistanê, Tirkîyê û Îraqê. Hetanî niha jî wana li tu welatekî da otonomî ne sitendine. Sebebên wê yekê jî usan in, ku ji goveka (çarçova) xebata me der in. Lê em wê jî bêjin, ku di nivîsên dîrokî da, di bîranînên rêwîya da em dixûnin, ku herêmeke pir mezin heye û navê wê Kurdistan e. Kurdistan ji çiyayên bakûrê Îraqê destpê dibe, tê digihîje hetanî Tirkîyê û Farizistanê û mezîla wê weke 125 hezar mîlên çargoşe ye(3). Berî ku Mêsopotamî ji nav axa Tirkîyê hate derxistinê û dane Îraqa "serbixwe" ya bin bandûra Îngilîs, piranîya kurda di dewleta Tirkîyê da dima. Em wê jî bêjin, ku niha jî ji nîvê kurda zêdetir li wir dimîne. Ji sê mîlyon kurda, ku li hemû herêma dimînin, kurdên Pişkavkazê jî di nav da, jimara kurdên Tirkîyê dike weke mîlyon û nîvek(4).

Jimara kurda li Tirkîyê rûyê wê yekê da jî zêde bû, ku bi peymana di navbera Komarên Rûsîya Sovêtîyê ya Sosîyalîstîyê ya Fêdêratîv (KRSSF) û Komara Tirkîyê da ya 16ê adarê sala 1921ê, herêma Qersê, perçekî devera Batimê û qeza Surmelîyê dane Tirkîyê û li ser wan axa gelek kurd jî diman.

Perçekî axa Kurdistana Bakûr û wilayetên Dîyarbekirê, Erzirûmê û pareke axa wilayeta Bexdadê, ku niha di dest Îraqê da ne, kete destê Tirkîyê. Lê wilayeta Dîyarbekirê bi navbenda Dîyarbekir û Bîtlîs, ku axên welatê kurda yên dîrokî ne, wek berê dihate binavkirinê wek Kurdistan, lê tenê bi fikra gêografî.

Li Farizistanê, ku perçê Kurdistanê yê rohilatê li wir e û him bi axa xwe, him jî bi binecîyên xwe va kêmtir e, ji 500 hetanî 750 hezar kurd lê dimînin û navbenda wê jî Kêrmanşah e.

Kurdistan, ku di nav çend dewleta da hatîye perçekirinê û kurd li wan dera têne hesibandinê wek miletên kêmjimar, berê jî, niha jî femdarîyeke gêografî ye û tê menaya axa ku kurd lê dimînin. Lê ew dikare di çarçova dîrokî û êtnografî da jî bê lênihêrandinê(5). Di dîrokê da ew him bi mezîla axa xwe, him jî bi jimara binecîyên xwe hatîye guhêrandin. Di dema Sêlcûka da (di sedsalên 11, 12, 13a da) Kurdistan dikete di navbera Azirbêcanê û Lûrîstanê da û ew herêm dihate binavkirinê wek perçê Kurdistanê yê rohilatê, lê girên Arman Cizîrê jî diketine di nav axa Kurdistana Bakûr. Di dewrana monxola da (sedsalên 13-14a) dema behsa herêmên çiyayî yên Hekarîyê, Bohtanê, roava perçê Antîtavrosê, ku dikeve nava axa Ermenîsatnê, devera Dêrsimê (bi resmî ew dihate binavkirinê wek wilayeta Kurdistanê) dikirin, navê Kurdistanê derbaz dibû (dihate bîranînê). Di dewrana Tîmûr da (dawîya sedsala 13a û destpêka sedsala 14a) dema derheqa mîrê Bîtlîsê

da xeber didan, wî dihesibandin merivê herî bi nav û deng li temamîya Kurdistanê da(6) û ew bi wê yekê va didane girêdanê, ku di wê dewranê da rola herêma Bîtlîsê temamîya Kurdistanê da giring bû. Me dikaribû ji dîroka Kurdistanê hinek malûmatîyên mayîn jî banîyana, lê ev jî bes e, ku meriv texmîn bike, ku navê "Kurdistan" navekî dîrokî ye.

Wek hûn zanin, kurd li Pişkavkazê jî dijîn, di nav wê da li bal me - Azirbêcanê jî. Lê, wek ku em pê hesîyan, ne li Pişkavkazê, ne jî li Azirbêcanê tu herêmeke ku kurd lê dimînin, heta sala 1923a ne hatîye binavkirinê wek Kurdistan. Û ew femdarîye jî: di tu herêmeke binavkirî da kurd piranî ne bûne. Emê vir şûnda li ser vê pirsê nesekinin. Em tenê bêjin, ku çend sebeb hebûne ku kurd ketine nava axa Rûsîya Qeyserîyê: ew bi zevtkirina Kavkazê ra girêdayî ye, ji şerê Sîsîanov destpêkirî (1804-1805), dû ra jî rûyê peymana Gulîstanê bi Farizistanê ra, peymana Turkmençayê (sala 1828a) û şerê 1877-1878a da(7). Piştî wan zevtkarîya xantîya Qerebaxê, ango axa herêma Yêlîzavêtpolê, herêma Êrîvanê, Qers û Erdehan ketine destê Rûsîyayê. Di van hemû herêma da bi binecîyên mayîn ra tevayî, kurd jî diman, piranîya wan jî koçer bûn. Em wê jî bêjin, ku di wan deman da gelek kurd ji axên zevtklirî yên Rûsîyayê mihacir bûne û ji Farizistanê jî mihacirî Rûsîyayê bûne. Derheqa wê yekê da çend îzbatî hene, ku me ji kronîka eskerî-dîrokî hildane û ew di pirtûka Avêryanov da jî çap bûne.

Em ji wana tenê nimûneyekê bînin:

"Wek xuya ye, qeyde-qanûnên nû ne bi dilê van merivên nû ne, ku hemwelatîya Rûsîyayê qebûl kirine (gilî derheqa xantîya Qerebaxê da ne, ku Rûsîyayê sala 1805a ew zevt kirîye), ji ber wê jî hineka ji wana şandine xantîya Êrîvanê; wek mînak, sala 1810a weke 180 malên kurda ji Qerebaxê revîne bal kurdên Êrîvanê, ji tirsa ku "rûs wê wana ji wan fariza neparêzin, ku zordestîyê li wan dikin; rastîyê jî, eskerên fariza hertim êrîşî li ser xantîya Qerebaxê dikirin û binecî dişêlandin, di nav wan da kurda jî"(8).

Şirovekirineke taybetî ne lazime bona texmîn bikin, ku ji bo çi kurd ji cî û warên xwe derketine, wek ku çawîşê barêgeha sereke derheqa wê yekê da di pirtûka xwe da dinivîse. Lê xudanê pirtûkê çend xeta jor xwe înkar dike û li xwe mukur tê, ku sebebên sereke ew destdirêjayên hukumeta Qeyserîyê bûn li ser erdê Rûsîyayê, ku wê ew zevt kiribûn.

Pişt ra Avêryanov dinivîse, ku "carna kurd ji Farizistanê mihacirî ser erdê me dibûn; wek mînak, di dawîya sala 1807a Memed Sefî Sultanê ji Qeredaxê, ku serokatî li 500-600 malên kurda dikir, destûr xwestîye, ku bi kurdên xwe va bên li xantîya Qerebaxê bi cî û war bibin".

Femdarî ye, ku kurdên ji zulm û zordestîyên desthilatdarîya fariza direvîyan, diketine rewşeke usa, çawa "meriv ji bin baranê bireve, bikeve bin teyrokê". Di nav dehsalîyên pêşin, yên piştî zevtkirina Kavkazê, gelek cara kurd ji Farizistanê mihacirî li ser axa Rûsîyayê bûne. Sebebê mihacirîyê yê sereke ew bû, ku zozanên Qerebaxê ji nav axa Farizistanê derketin û ketine nava axa Rûsîyayê û kurd havîna xwe li wan zozana derbaz dikirin. Em ne bi wê fikra V.Gûrko-Kryajîn ra nin, ku

kurdên li ser axa herêma Yêlîzavêtpolê dimînin, di destpêka sedsala 19a da hatine wira, ew jî girêdayî bi zevtkirinên rûsa ra.

Tiştek ji sedî sed e, ku eşîrên kurdên koçer berî zevtkarîyên rûsa hatine van dera û hetanî niha jî vira dijîn. Derheqa vê yekê da di çavkanîya derheqa dîroka kurda - Şeref-Namê da hene, ku salnivîsarîya gelê kurd ya sereke ye di dawîya sedsala 16an da. Xudanê ewê salnivîsarê - Şeref xan, ku hukumdarê Bîtlîsê yê bi nav û deng bûye, di şerê di navbera qiralîyeta fariza ya Sêfêvîda û Tirkîyê da roleke mezin lîstîye. Nava serketinên Tirkîyê di şerên bi Farizistanê ra, ku di dawîya sedsala 16a da qewimîne, rola Şerefeddîn pir bûye.

Di vê berhema dîrokî da malûmatîyên hewaskar hene derheqa wê yekê da, ku eşîrên kurda gelek dem berî zevtkirinên rûsa, di dema şerên Şah Abbas da hatine herêma Qerebaxê. Wek nimûne, girêdayî êrîşên tirka yên bi serokatîya Ferhad paşa ra, em rastî nivîseke awa tên:

"Hema di wê salê da (1587-1588) serdar Ferhad paşa şer tevrakir bona Genceyê û Bêrdê paşda vegerîne. Dema ewî ew herêm zevt kir, miletekî biçûk - qecera û bîst û çar eşîr (an jî bîst û çar eşîrên kurda "iguirmy deurte") (di têkstêda bi farizî, bi tîpên erebî hatîye nivîsar.....) û turkomana ji wir raqetandin"(9).

Pişt ra derheqa êrîşkarîyên Ferhad paşa li ser Qerebaxê da tê gilîkirinê. Xwedîyê nivîsê li ser bingehên çevkanîyên mayîn tîne ber çevan, ku "bîst û çar eşîrên kurda, ku bi tirkî ji wan ra dihate gotin ....., di dewrana Şerefeddîn da hatibûn, li Qerebaxê hêwirîbûn, ku niha bin destê împêratorîya Rûsîyayê da ne"(10).

Wek ji nivîsê xuya dibe, ew eşîr ji eşîrên kurda yên ne bi nav û deng in û, wek ku xwedîyê nivîsê rast texmîn kirîye, ew qebîl û berek in, lê ne eşîret in û eger em navên wan bidne rêzê, wê gelek cî bigre.

Di nivîsa Şerefeddîn da em rastî malûmatîyên derheqa jimara kurda di wan navça da ne hatin. Lê wek ku ji hinek îzbatîyên di nivîsê da xuya dibin, tu şik tune ku kurd gelek wext berî zevtkirinên Rûsîyayê hatine vira. Ewana himberî miletên mayîn, ku piranîya wan jî turk bûn, pir hindik bûn. Wek me dît, navê tirkî li eşîrên kurda kiribûn. Bi bawerîya me kurd ji navçeyên Farizstanê û Tirkîyê kom bi kom anîne vira bona parastina sînora, an jî ji bo bi destî hêza wana bikaribin axên zevtkirî bin destê xwe da xwey bikin. Di dîroka kurda da tiştên usa gelek bûne. Derheqa wê yekê da di berhemên dîrokî yên derheqa Farizistanê da hene, wek mînak di berhema Sayks da, dema ew qala dewrana Şah Abbas dike(11). Lê em nikarin ji sedî sed bêjin, ku kurd di dema qiralîyeta Yêlîzavêtpolê da mihacirî vira bûne, wek ku ew yek Çûrsîn dibêje(12), bin destê me da îzbatîyên usa tunene. Di bin destê me da hema bêje tu malûmatî tune derheqa wê yekê da, ku di dema zevtkirinên rûsa da jimara kurda li vê herêmê çiqas bûye, û nizanin jî ku ew li kîderê û çawa cîguhastî bûne, ji warekî çûne warekî mayîn. Ser vê meselê V-Gûrko.Kryajîn xwestîye zelalîyekê raxe ber çeva, lê ew yek li wî ra li hev ne hatîye, ew di wî karî da bi ser neketîye.

Em wê jî bêjin, ku dûrbûna kurdên Azirbêcana bin bandûra herêma Yêlîzavêtpolê ji navçeyên ser sînor dibû sebeb, ku hukumeta qeyserîyê, ku kurda wek hêz bi kar dianî bona şerê bi cînara ra, tu ferq danetanî di navbera kurdên Yêlîzavêtpolê û binecîyên musulman yên mayîn da.

Em binhêrin çika Avêryanov derheqa vê yekê da çi nivîsîye: "Kurdên herêma Yêlîzavêtpolê lap ji kurdên Rîsîyayê yên mayîn hatine birînê, ji ber ku di navbera wan û kurdên Êrîvanê da ser mezîla bi dirêjaya 130-150 kîlomêtra hemû çiya ne û li wan dera hema bêje rê tunene. Dema di navbera Rûsîyayê û Tirkîyê da şer derketa, kurd nikaribûn bihatana hewara rûsa, ji ber ku dûr bûn û ewê yekê jî kemala kurda ya sîyasî dida undakirinê; eger bi Farizistanê ra jî şer derkeve, dîsa destê kurda wê negihîje wan dera, ji ber ku ew li mentîqên herêma Yêlîzavêtpolê yên here dûrî-derez da dimînin û ewê tu rolekê nelîzin"(13).

Ji ber wê yekê jî tu guhdarîke taybetî danenîn li ser kurdên Azirbêcanê, heta li ser jimara wan jî.

Bona wê yekê jî ferqîya wan malûmetîyên derheqa jimara kurdên Azirbêcanê da, ku hinek nivîsa û çevkanîyan da rastî me tên, gelekî mezin e.

Bi bawerîya Avêryanov, jimara kurdên ku di dawîya sedsala 19a li herêma Yêlîzavêtpolê diman, 35-40 hezar bû(14). Serhing Karsêv(15) jî hema bêje ewqas dibêje û wek ew bi xwe dibêje, ewî ew reqem ji malûmatîyên Komîtêya Statîstîkîyê ya Pişkavkazê wergirtîye.

Doktor A.M.Dîrr di lêkolînên xwe yên di hêla antropologîyê û êtnografîyê yên derheqa gelên Kavkazê da dinivîse, ku li herêma Yêlîzavêtpolê 52 hezar kurd hene. Ev malûmatîyên sala 1910an in û derheqa vê yekê da di Kalêndara (Salname) Kavkazê da jî hatîye nivîsar(16). Lê hema eynî di wê "Kalêndara Kavkazê" da, ya sala 1910a da lap reqemên mayîn anîne derheqa jimara wan kurda da, ku bi zimanê dayîka xwe dipeyîvin.

Di perçên wê rojnîşê da, ku li "Kalêndara Kavkazê" da çap bûne û tê binavkirinê "Jimara binecîyên Kavkazê gorî zimanên dayîkê, anegorî hesabkirina binecîya ya sala 1897a (Weşanxana Komîtêya Statîstîkîyê ya Navbendî, sal 1905)", jimara binecîyên kurd ha ye:

Di herêma Bekûyê da - 6 mêr û 2 jin (6+2), li Daxistanê 11+11, li herêma Yêlîzavêtpolê 1663+1379, devera Qersê 22632+20336, herêma Kûtaîsê 935+889, mentîqa Têrskê 13+6, herêma Tîflîsê 1400+1138, der-dorê derya Reş 22, herêma Êrîvanê 26239+23150.

Bi tevayî - 49389.

Bi vî awayî, gorî hesabkirina binecîya ya sala 1897a ji hemû kurdan (99832), ku li Kavkazê dimînin û bi zimanê xwe dipeyîvin, 3042 li Yêlîzavêtpolê ne. Eva tenê derheqa wan kurda da, ku zimanê dayîkê kurdî dihesibînin.

Li "Kalêndara Kavkazê" ya sala 1917a da malûmatî hene derheqa mezîl û binecîyên herêma Kavkazê da (gorî 1ê çileya paşin, sala 1916a). Binecîyên kurd li wir haqas in:

	Musulman	Êzdî
Li herêma Bekûyê.....	501	191
Li herêma Yêlîzavêtpolê.....	3802	-
Li devera Batimê.....	552	-
Li devera Qersê.....	49752	17698
Li herêma Tîflîsê.....	5932	4697
Li herêma Êrîvanê.....	36508	12624

Bi tevayî 97.047 musulman, 35.210 êzdî.

Vira me malûmatîyên derheqa kurda yên di hêla dînî da anîn, û em nizanin ji bo çi hetanî niha kurdên Êrîvanê (bi dînê xwe va êzdî) ji wan kurdên mayîn hatine cihêkirinê, ku pirtir in û dînê hemûyan jî mehemedî ye, ango - musulmanî ye. Em wê jî bêjin, ku cudakirina kurdên êzdî ji kurdên musulman ji hesabkirina binecîyên Pişkavkazê destpê bû, ku sala 1926a hate derbazkirinê.

Ev malûmatîyên me anîn, bi awakî zelal tînine ber çeva, ku berê, ango berî testîqbûna qeydê Sovêtîyê li bal me, di pirsa hesabkirina binecîyên kurdên Azirbêcanê da tevlihevîyek hebû.

Femdarî ye, ku ew yek tesîra xwe li ser hesabkirina kurdên Azirbêcanê ya piştî Sovêtîyê jî hîşt. Em ser wê bawerîyê ne, ku terefdarên wê proêktê, ku gorî wê otonomîya dane Kurdistanê, hema bêje hemû binecîyên herêmê wek kurd nîşan dane. Usa xuya ye, ku eva yeka di dest wan da argûmênta here xurt bûye bona îzbat bikin, ku hêja ye otonomîyê bidne kurda. Lê wek me dît, ew bahana wan jî li ser bingehekî ne mehkem (zexm, qewîn) hatibû çêkirinê.

Ew fikra lap şaş, ku piranîya binecîyên Kurdistana berê kurd bûne, hetanî îro jî heye. Em ecêbekê ji we ra bêjin: gorî malûmatîyên Plana Dewletê ya KSS Azirbêcanê, ku êkspêdîsyona me berî ku bi rê keve, sitend, jimara kurda li navça Laçînê 99,2%, li navça Kelbecarê 99,5% bû. Jimara turka di herdu navça da 180 (!) merî bû: 108 merî li Laçînê, 72 jî li navça Kelbecarê.

Ewê yekê em di nav salixên hesabkirina binecîya ya sala 1926a da jî dibînin. Gorî wê statîstîkê, ku înspêktorê Komîsarîyata Perwerdeya Gelî Îlyasov raber kirîye, jimara kurda li her pênc navçeyên Kurdistana wî çaxî da aha bûye:

Li navça Karakişlaxê jimara kurda 6033 merî bûye û ji wana 1758 bi zimanê dayka xwe dipeyîvin. Li navça Kelbecarê ji 11993a - 1438 merî, li navça Kurdhecîyê ji 8173a - 691, li navça Mûradxanliyê ji 6159a - 429, li navça Koturlînê ji 5885a - 955 merî.

Jimara kurda li navça Kubetlîyê bi hesabkirina binecîyan ya sala 1926a ji 200 merivî derbaztir nebûye.

Tevaya kurdên Azirbêcanê yên li herêma Kurdistana berê gorî statîstîka sala 1926a 37182 bû, ku dikire 72,2% temamîya binecîya, lê ji wana kesên ku bi zimanê xwe dipeyîvîn, 3123 merî bûn.

Ji bo êkspêdîsyona me di wî alî da pirsa sereke ew bû, çika miletê kurd bi çi zimanî dipeyîve. Xênji wê me hewl da em bizanibin çi milet li wê herêmê dimînin û piranîya wan jî kê ne.

Piştî lêkolînan me çarçoveke awa çê kir, ku bi awakî zelal tîne ber çeva çika di wan navça da çiqas kurd bi zimanê xwe dipeyîvin.

Kurd wek miletekî kêmjimar

Me dixwest bi vê pirsê va dawî li nivîsa xwe bînin. Em di dawîya xebata xwe da li ser vê pirsê sekinîn û me ew yek ne ji bo wê yekê kir, ku ew pirs ne gelekî giring e, lê eksî wê, ji giringîya wê me usa kir û ew di nav pirsên ku êkspêdîsyonê danîbûne ber xwe, yeke here giring bû. Ango, wek ku mesela îngilîsa dibêje: "Last but not least", yanî bi jimarê va ya dawî ye, lê ne bi kemala (naveroka) xwe va.

Him li navça Kelbecarê, him jî li navça Laçînê, kurdên ku zimanê xwe parastine, piranî li gundan dimînin. Cînarên wan turk in û bi hevdu ra bi tirkî dipeyîvin, ku ji bo kurdên Azirbêcanê zimanê dudan e.

Em wê yekê dikarin derheqa kurdên herêma Naxçiwanê da jî bêjin, lê li vira rewş hinekî cuda ye.

Kurdên Zîlanê, ku niha li KSS Naxçiwanê dimînin, hetanî berî nîsana sala 1920î li Azirbêcanê ne li ser hev diman. Dewrana mûsafata-daşnaka ya bi xwîn di sala 1919a da, şerê herdemî, xweserîtîyên cerdên daşnaka yên bi serokatîya gênêral Dro kurd mecbûr dikirin, ku warên xwe bihêlin û birevine Tirkîyê û Farizistanê.

Piştî testîqbûn û mehkembûna qeydê Sovêtîyê, kurd destpê kirin vegerîyan. Sala 1926a gelek kurd ji wî berê çiyayê Araratê vegerîyan û piranîya wan li navça Erezdayanê bi cî bûn.

Gorî hesabkirina binecîya ku Komîsarîyata Perwerdeya gelî derbaz kiribû, jimara binecîyên kurd li herêma Naxçiwanê 3180 merî bû. Wek me berê jî gotîye, piranîya wan li navça Şarûr-Stalînê (Noraşêna berê) û li ser axa navça Erezdayanê diman, ku berê axa gundê Sederekê bû.

Gorî malûmatîyên şêwra navçê, berî destpêkirina êkspêdîsyonê jimara kurda 2884 meriv bû (1531 mêr û 1353 jin).

Xênji wê, kurd di gundên wê navçê yên mayîn da jî dimînin, û di wan gunda da piranîya binecîyan turk in; tenê çend gunda da (wek mînak, li gundê Derekendê, ku ji 283 binecîya tenê 3 kes turk in) binecî hema bêje hemû kurd in.

Wek ku endamên êkspêdîsyonê yên zimanzan azirû kirin, kurdên Naxçiwanê jî bi du zimana dipeyîvin, lê bi kurdîyeke paqij dipeyîvin û tesîra zimanê tirkî li ser wan pir kêm e; em wê jî bêjin, ku lêkolînên me dane îzabtkirinê, ku zimanê kurdên Naxçiwanê gelekî nêzîkî zimanê kurdên Ermenîsatnê ye. Hela ser da jî, ew diha paqij maye, ne ku bal kurdên Ermenîstanê. Lê zimanê kurdên Laçînê û Kelbecarê tevlihev bûye. Vira tesîra zimanê tirkî ewqas pir e, ku ewê fonêtîka, morfologîya, lo heta aksênta (lewz, akil) zmanê kurdî jî guhartîye. Lê li herêma Naxçiwanê, navça Şarûr-Stalînê jî di nav da, kurd himberî binecîyên turk ewqas kêm in, ku wek kêmjimar têne hesibandin.

Rast e, di nava bi seda salan da kurd bi turka ra helîyane, ji ber ku der-dorên navçeyên Laçînê û Kelbecarê da timê jî turk bi jimara xwe va gelekî ser kurda ra bûne, lê dîsa jî geleka ziman û erf-edetên xwe ji bîr nekirine. Ew yek jî alî vê pêvajoyê kirîye, ku heta berî testîqbûna qeydê Sovêtîyê li Azirbêcanê, kurd miletekî paşketî bû û di nav jîyana eşîrtîyê da bû.

Hukumeta qeyserîyê, dû ra jî hukumeta musafatîsta, tenê bi wî çevî li kurda dinihêrîn, ku wana di şerê bi cînara ra bi kar bînin.

Sîyaseta mûsafatîsta hindava kurda da ji ya Rûsîya qeyserîyê nedihate cudakirinê, ew wek berê dihatine zêrandinê û Rûsîya qeyserîyê ji bo gelên biçûk bûbû hebiseke mezin.

Lê di dema hukumdarîya mûsafatîsta da, ku dirêj nekişand, kurd di hêla aborî û sîyasî da di rewşeke diha xirab da bûn. Me îdî derheqa fikra Avêryanov hindava kurdên Yêlîzavêtpolê da ji we ra gotîye. Dîwana qeyserîyê qet guh ne dida rewşa wan û bi çavê "musulmanên ji der hatî" li wan dinihêrî. Bi vê fikrê va Avêryanov rast dibêje, ku: "Piranîya kurdên herêma Yêlîzavêtpolê hukumê rûsa li ser xwe texmîn nakin, dîwan derheqa wan da hema bêje qet tiştekî nizane û tu xemxurîyekê hindava wan da dîyar nake û xema kurda jî nîne, ku ew bin hukumê kê da nin; ji ber wê jî nexwendîtî li bal kurdan pir e"(1).

Hukumeta qeyserîyê hewl ne dida, ku di nav kurda da nexwendîtîyê bide hilanînê û ew "bêxemîya" kurdên Yêlîpzavêtpolê(2) hindava hukumetê da bi dilê çîna desthilatdar bû, ji ber ku ewê xwe ji wê yekê xilaz dikir, ku gerekê gelek cara problêmên wan yên cuda-cuda, di nav wan da yên navxweyî jî, çareser bikira. Hukumeta mûsafatîsta jî hewl dida usa li ser pirsa kurda bisekine, wek ku ew yek hukumeta qeyserîyê kiribû. Lê bi ferqekê: eger hukumeta qeyserîyê ne alî kurda dikir, ne jî eleqê xwe pê dianî, lê hukumeta mûsafatîsta hewl dida kurda bi kar bîne. Ji ber wê jî hukumeta mûsafatîsta bi hevkarîya casûsê xwe - derebegê mezin û gênêral-welîyê Qerebaxê Xosrow beg Sultanov, biryar kir kurda bike di nava qulixkirina eskerîyê da, û hewl dida desteyên (alayên) kurda bi kar bîne bona biserxistina "sîyaseta xwe ya miletîyê".

Derheqa vê yekê da A.Stêklov di lêkolîna xwe ya derheqa ordîya mûsafatîsta da aha nivîsîye: "Wezîreta parastinê proêktek amade kirîye, ku ji binecîyên kurdên Qerebaxê alaya "kazakên Azirbêcanê" saz bike, bona nehêle, ku daşnakên ermenî ji alîyê Ermenîstanê hindava Qerebaxê da destdirêjayan bikin. Gorî proêktê gerekê ji binecîyên kurd taxbûreke eskerên peya û alaya eskerên siyarî (ji dused kurda) bihatana sazkirinê. Eger şer bibûya, gorî proêktê dikaribûn alayên kurda bişandana dervayî Qerebaxê jî. Qulixkirina di nav eskerîyê da 2 sal hatibû kivşkirinê. Ew kurdên, ku gazî eskerîyê dikirin, gerekê bi çek-rihala va bihata, lê kesên ku gerekê di alaya siyarî da qulix bikirana, gerekê bi hespên xwe va bihatana û zîn-bûsatê hespa jî gerekê usa bûna, ku kêrî şêr bihatana. Eger di van kara da kêmanîyek hebûya, ew eşîr gerekê bersîvê bida, ku eskerên peya, an jî siyarî dane dewletê û eşîr bi xwe gerekê wan dem-dezga û çek-rihala biguhêranda, ku komîsyonê ew kêrnehatî bihesibanda. Eskerên peya û siyarî bi

xwe gerekê li cil û çek-rihalên xwe mêze bikin û eger kêmanîyên biçûk hebin, ew bi kîsî xwe gerekê bidne hilanînê, lê nûkirina çek û sîliha, xwerina eskera û hespa li ser dewletê ye. Di rex xwendinxana eskerîyê ya ji bo amadekirina zabita, beşa amadekirina 20 zabitên kurd jî hebû. Alayên kurda piştî biryara komîtêya parastina dewletê ya dawîya çirîya pêşin sala 1919a destbi teşkîlkirina wî karî kirin, lê pêra negîhandin heta testîqbûna qeydê Sovêtîyê li Azirbêcanê xilaz bikin. Ev "neciddîtîya" kurda hêrsa gênêral-welîyê Qerebaxê, milkedarê mezin Xosrow beg Sultanov gelekî rakir, yê ku serkarî li wan dikir û gundîyên kurd di nav rebenîyê û tengezarîyê da hîştibû. Ji ber wê jî ewî bacên ji berê girantir danî ser kurda, ku bêy wê jî pir giran bûn"(3).

Em wê jî bêjin, ku mûsafatîsta ne tenê bi vê yekê va zor li kurda dikirin. Temamîya sîstêma mûsafata di "sîyaseta xwe ya miletîyê" da tam dijî gelê kurd bû. Zordestîya wan ya hindava kurda da ji ya qeyserîyê xurttir bû. Ji ber ku derebegên turka yên zulmkar bi serokatîya Sûltanov di navçeyên kurd lê diman da temamîya hukum xistibûne bin destê xwe û di wî karî da pêşî hêvîya xwe danîbûne li ser casûsên tirka, paşê jî ser yên îngilîs. Temamîya hukumê dewletê di bin destê milkedarên wek wan da bû.

Me îdî derheqa xweserîtî û destdirêjayên begên Sultanova da got, ku cerdên wan piranî li navçeyên Laçînê û Kelbecarê da kar dikirin. Lê hukumê wan li temamîya Kurdistanê jî derbaz dibû. Di navça Kelbecarê da hukum di dest merivên Sultanova da bû, ku begên Koturlûyê bûn. Zordestîyên ku wan li milet û xwesma jî li kurda dikirin, bi hovîtîyên xwe va "deng dabûn". Wana berî mûsafata jî zor li milet kiribû. Lê dema hukumeta bi dilê wan ya milkedarîyê-bûrjûazîyê hate ser hukum, wana ciyê lingê xwe diha qewîn kirin û bi saya serê wê yekê, ku pismamên Sultanova bûn, destûra her tiştî didan wan.

Begên Koturlûyê li gundên ku nêzîkî warê wan yê jîyînê bûn (cîkî weke kela Koturlûyê, ku nîvhedimî bû) ji merivên ku şurîya wan pê dibirî (bawerîya xwe pê dianîn) cerd çê dikirin û êrîşî him li ser gundên turka dikirin, him jî xwesma yên kurda; gundên kurda diha bêxweyî bûn, kesî wana nediparêzî. Wana degme (kêm cara) êrîş dibirine li ser koçera, ji ber ku koçer çekdar bûn. Dema cerdên wan diketine gunda, gundî hemû ji cî û warên xwe derdiketin, direvîyan. Hin cara gundîya ber xwe didan, ew jî bi ser ne diketin. Kîjan mêr biketa ber destê wan, digirtin, dibirin warê xwe û wana wek qûl (hêsîr) bi kar dianîn. Ne hewce ye em bêjin, ku wana ber karê xwe va tu pere nedistendin, hela ser da jî bi qamçîya li pişta wan kesa dixistin, yên ku hewl didan ber xwe bidin, an jî gurra cerdvana ne dikirin. Di dema kar jî ew hêsîr gerekê kîsî xwe nan bixwerana.

Di dema hukumdarîya mûsafatîsta da dizîya heywanên gundîya, dakutana li malên xelqê, talan û şêlandin tiştên rojane bûn. Ji bo milkedarên kirêt tu sînor tunebûn. Ji me ra digotin, ku di dema êrîşeke li ser gundê kurda, bega bona tirsfirandinê çend gulle berdane hewê.

Pişt ra jî begên Koturlûyê gundîya mecbûr kirin heqê fişekên ku cîyê belasebeb berdabûn, bidin. Eger gundî nedana, dest datanîn ser hebûna wan.

Kesên, ku hewl didan milet organîze bikin bona berxwedanê, bi hovîtî dihatine kuştinê. Şertên usa danîbûn, ku ber her begekî kuştî va, gerekê hemû neferên malekê bihatana kuştinê. Ji tirsa heyfhildana xwînî geleka warên xwe dihîştin û diçûn. Ev xweserîtîyên begên Sultanova hindava binecîyên bê çek yên navçeyên Laçînê û Kûbatlîyê cerdvanên mûsafata yên ji Kotûrlûyê ruhdar dikirin û wana zordestîyên xwe diha zêde dikirin. Ev hemû bi dilê hukumeta mûsafata ya nevbendî bû jî.

Bi van yeka ra girêdayî zordestîyên li ser kurda zêde dibûn, qerfên xwe bi zimanê kurdî û gelê kurd dikirin. Milkedarên mûsafatîst henekê xwe bi kurda dikirin, ji ber wê jî di hinek gunda da sond didane xwerinê, ku bi zimanê kurdî nepeyîvin. Wek mînak, ew yek li gundê Kemalliyê, navça Laçînê bûye. Zordarîya milkedar-derebega çiqas pir dibû, mînakên usa zêdetir dibûn.

Bi bawerîya me, ev hemû pêvajoya asîmîlebûna kurda dida lezkirinê û bi wê ra tevayî jî kurda pêwendîyên xwe bi xelqê ra didane birînê û tenê bi hevdu ra danûsitendin dikirin. Rewş usa bûbû, ku kurda bi mecbûrî turkî xeber didan, ji ber ku zimanê tek-tenê, ku hemû kes dikaribûn di wan navça da hev fêm bikin, turkî bû, lê kurda bi hevdu ra kurdî dipeyîvîn, ew jî piranî ji bo wê yekê, ku tiştekî surî xeber didin, binecîyên cînarên wan ji wan fêm nekin.

Lê pêvajoya asîmîlebûnê bi sebebên mayîn jî dibû. Berî her tiştî, di wan navça da kurd miletekî kêmjimar bû, ew ji eşîrên kurdên Pişkavkazê hatibûne birînê, pêwendîyên wan bi kurdên Naxçiwanê û Êrîvanê ra hema bêje tunebûn, der-dorên wan piranî turk bûn. Me texmîn kir, ku hema bêje di hemû gunda da gelek kurd bi turka ra zewicî bûn, an jî keçê xwe dabûne wan. Hin caran ji zewac-mêrkirinê turka zimanê kurdî fêr dibûn, lê dîsa jî zimanê axaftina rojane ji bo wan turkî bû. Di dema sohbetên me, kurdên ku di gundên turka da diman, an jî di gundên xwe da bi turka ra diman, digotin, ku zewac-mêrkirinên usa dibine sebebê wê yekê, ku ew kurdî ji bîra dikin, zarokên wan jî ji wan xirabtir zanin. Pevgirêdanên bi koçerên turka ra, di dema zivistana da çûyîna kurda berbi deştê, li ku piranî turkî dipeyîvin, herweha ew yek jî, ku temamîya kirîn-firotanê hema bêje di dest turka û ermenîya da bû, asîmîlebûna kurda dane lezkirinê.

Lê gerekê bê kivşkirinê, ku pêvajoya asîmîlebûna kurda gelek kûr nebûye, wek ku ew di salixên hesabkirina jimara gela da xuya dibe û mûsafatîst jî dixwezin ku usa be.

Damezirandina herêma Kurdistanê sala 1923a, ku jê ra Kurdistana Azirbêcanê jî dihate gotinê, bû sebeb, ku piranîya binecîyên turk jî xwe kurd hesibandin û miletîya xwe bi navê wî erdî va girê didan, ku li ser diman.

Dewlemendên kurda û turka jî hewl dan ji "kurdîtîyê" karê kevin. Ango, piş perda kurdbûnê da karê xwe bimeşînin, ji wan ardimîya feydê bibînin, ku li Azirbêcana Sovêtîyê û Yekîtîya Sovyêt tevayî da ji bo miletên kêmjimar hatibûne kivşkirinê.

Şaşîyên rêxistinên di cîyada yên di hêla derbazkirina sîyaseta miletîyê da û biçûkdîtina wê, dema çareserkirina problêmên miletîyê yên bingehîn piş guhê xwe va hatibûn avîtin, ewê pirsa sext diha tevlihev kir.

Heta van demên dawî jî paşmayînên ewê "sîyasetê" nehatibûne hilanînê.

Dema êkspêdîsyona me bi rêxistinên navça Laçînê ra kar dikir, bêlî bû, ku biryar hatibû girtinê di her karî da serdestîyê bidne wan kesa, yên ku bi zimanê kurdî diaxifin. Tu şik tune, ku di van şertan da wê jimara kesên kurdîaxêf pir zêde bûya. Û usa jî bû.

Parevekirina Kurdistanê li ser navça (sala 1929a), pêşdabirina karê malhebûnîyê û kulturîyê û bi wan yeka ra girêdayî bilindbûna dereca femdarîya xebatkarên navçeyên dûr, bûne sebeb, ku di nav gelên herêmê da zêde dostanî çê bû, ewana bi hev ra ketine nava karê çêkirina sosîyalîzmê û piştî hesabkirina binecîya ra, ku Komîtêya Perwerdeya Gelî dabû derbazkirinê, jimara gela bi kêm-zêde rast derketin û milet îdî zêde guh nedida pirsên miletîyê yên usa, ku dikaribûn bîna wan bi hevdu teng bikirana.

Lêkolînên me dane xuyakirin, ku kurdên ku ser hev (kompakt) dimînin, zimanê dayka xwe ji bîr nekirine. Û ew gotinên îdêologekî mûsafatîsta M.H.Vêlîyev (Baharli) vir û derew in, ku ewî di nivîsa xwe ya di prêssa Sovêtîyê da çap kirîye derheqa xebata dijî şoreşê li Azirbêcanê û di wê da dide xuyakirin, ku zimanê kurda xudêgiravî berbi mirinê diçe. Û ne tenê zimanê kurdî. Em binhêrin çika ew derheqa zimanê gelên biçûk yên li ser axa Azirbêcanê dimînin, çi dinivîse: "Zimanê turkî niha zor dide gelek zimana, ku dewra xwe buhurandine, wek nimûne, zimanên teta, talîşa, lezgîna û kurda(4).

Em van fikrên dijî şoreşê, ku di bernama mûsafatîzmê ya di pirsa miletîyê da hene, ne tenê ji bo wê yekê derdixine ser avê, ku rûyê wana eşkere bikin û bidine kivşkirinê, ku ew dijî sîyaseta dewleta Sovêtîyê ya hindava pirsa miletîyê da nin, lê ji bo wê yekê jî, ku bi gotina wan ew sîyaset xudêgiravî "civaka turka û azirîya ya hevgirtî ji hev dixe", û mûsafatîst kurda jî li ser wan dihesibînin, him di hêla xwînî da, him jî di hêla dîn da(5).

Weşandina nivîsa dijî şoreşê ya îdêologekî mûsafata, ku heta niha jî nehatîye rexnekirinê û înkarkirinê, di rûyê wê yekê da ne, ku haya pareke weşanxanên Sovêtîyê û dayîrên zanyarî-lêkolînê ji sîyaseta dewleta Sovêtîyê di pirsa miletîyê da tune, ji ber wê jî nivîsên usa derdikevin, ku bi naveroka xwe va propoganda dijî şoreşê ne.

Lê em ji bo wê yekê ewê nivîsa mûsafatîsta bîr tînin, ji ber ku ew bi fikrên xwe va gelekî nêzîkî sîyaseta şovînîstîyê ya hinek serekên Komîtêya Perwerdeya Gelî ye, ku wana heta sala 1930î hindava miletên kêmjimar yên Azirbêcanê da derbaz kirine.

Mûsafatîsta helan didane hinek serekên Komîtêya Perwerdeya Gelî ya Azirbêcanê bona derkevine dijî bi cûrê Lênînîyê derbazkirina sîyaseta miletîyê,

bona ew bi cûrê xwe pirsa miletên kêmjimar çareser bikin, ango nehêlin, ku dibistanên bi zimanê wan gelan hebin û ew çanda xwe pêşda bibin.

Kurd jî bi miletên mayîn yên kêmjimar (lezgîna, avara û yên din) ketine ber wê derbê.

Ew yek li şêwrdarîya komarê ya miletên kêmjimar da bi awakî geş hate ber çeva, ku bi pêşdestîya (însîyatîv) serokatîya partîya bolşêvîka ya Komîtêya Navbendî ya PK Azirbêcanê, Komîtêya Kultûrî ya KN PK Azirbêcanê û Komîtêya Perwerdeya Gelî di meha hezîranê sala 1931ê hatibû teşkîlkirinê.

Wek ku li wê şêwrdarîyê hate kivşkirinê, hela sala 1924a çend xebatkarên Kurdistanê pirs danîbûne ber Komîtêya Perwerdeya Gelî bona dibistanên bi zimanê kurdî vekin. Tevgelekî ewê şêwrdarîyê - Îlyasov, ku serekê para xwendinê ya Kurdistanê bû, di xeberdana xwe da li ser pirsa sazkirina elfaba kurdî sekinîbû û weha gotibû:

"Di dema xwe da li Azirbêcanê jî ji bo wî karî çend gav hatibûne avîtinê. Elfaba Kurdistanê ya yekemîn me sala 1924a amade kir û şande Komîtêya Perwerdeya Gelî.

Lê, mixabin, him elfaba, him jî pirtûka dersa ya ji bo destpêkê nehatine qebûlkirin. Ew pirs ser demekê paşda êxistin..."(6).

Lê hema ew Îlyasov di wê xeberdana xwe da ew serketinên mezin destnîşan kirin, ku ewana li Kurdistanê di hêla pêşdabirina çand da gihîştinê û wek mînak tenê nimûna navçeke Kurdistana berê (ji sê navça) - navça Laçînê anî: "Niha li bal me 100 dibistanên destpêkî, 3 dibistanên hevfsale, xwendegeheke malhebûna gundîtîyê, 12 pirtûkxane, 3 komela û h.w.d. hene.

Ji 450î zêdetir gencên kurda li dayîrên xwendina navîn da dixûnin. Di nav kurda da doktor, mihandiz, kutakirîyên Akadêmîya û Ûnîvêrsîtêta hene. Em bawer in, ku di vê pêncsalîyê da emê bikaribin di nav hemû kurdên Azirbêcanê da nexwendîtîyê bidne hilanînê, eger ne bi 100 selefa, qe na bi 80 selefa. Gorî plana Komîtêya Perwerdeya Gelî me bi nûkirina dibistanên kevin ra tevayî, destbi çêkirina 14 dibistanên nû kirine (sala 1931ê): li navça Kelbecarê 3, li Kubetlîyê 4 û li Laçînê 7".

Em dixwezin wê yekê jî bînine ber çeva û li xwe mukur bên, ku bi şaşîyan ra tevayî, ku çend xebatkarên Komîtêya Perwerdeya Gelî ya berê (heta sala 1930î) berdane, me heta niha jî li Azirbêcanê karê bona pêşabirina zimanê kurdî, vekirina dibistana, çêkirina elfabayê, pêşdabirina çanda bi zimanê xwe, ku bi fikra xwe ya întêrnasyonalîstîyê be, lê bi naveroka xwe ya miletîyê be, wek ku partîya ji me dixweze, nekirîye. Di wê pirsê da em gunehkar in.

Hema bêje li wan hemû civînên partîyê û komsomola, herweha li civînên gundîyên kurd û turk, kolxozvana da, ku endamên êkspêdîsyona me tevî wan dibûn, li her dera hindava sîyaseta Komîtêya Perwerdeya Gelî ya heta berî sala 1930a rexne dibarîn, ku ne tenê tu kar nekirine, lê hela ser da jî karê çêkirina

dibistana û pêşdabirina çanda kurda ya bi zimanê kurdî berbend kirine û hezar û yek asteng danîne ber.

Bi vê yekê ra girêdayî em dixwezin wê xeberdana profêsorê Ûnîvêrsîtêta Azirbêcanê ya Dewletê Jûzê raxine ber çevên we, ku ewî meha çileya pêşin sala 1930î girêdayî pirsa kurda ra kirîye. Ew pirs Para (Beşa) Rohilata Nêzîk ya Înstîtûta Zanyarî-Lêkolînê ya Ûnîvêrsîtêta Azirbêcanê amade kiribû.

Emê hûrgilîyên ewê xeberdanê ji we ra nebêjin, lê em tenê wê bêjin, ku di wê civînê da gelek kes dijî wî derketin. Me derheqa ewê xeberdanê da gotareke taybetî nivîsand(7).

Lê bi pirseke mayîn va girêdayî, ku emê li jêr li ser bisekinin, em dixwezin rûyê dijminên şoreşê hinekî vekin.

Wek me îdî nivîsîye, fikra xeberdana Jûzê ew bû, ku ewî pesinê desthilatdarîya împêrîyalîzma Îngilîs ya dagîrkar dida, ku çawa sîyaseta "pêşketinê" û "ya pêşverû" derbaz dike, ku bin nîrê wê da bi mîlyona qûlên (hêsîr) bindest dixwezin xwe rizgar bikin.

Kurd, ku piranîya wan li welatên dereke - li Farizistanê, Tirkîyê û Îraqê - dimînin, wek miletekî kêmjmar têne zêrandinê, him ji alîyê derebeg û begê "xwe da", him jî ji zordestîyên dijmina.

Xwesma rewşa kurdên Îraqê xirab e, ku piranîya binecîyên bakûr-rohilata wê kurd in. Împêrîyalîzma Îngilîs, ku qiralîyeta Îraqê ya "serbixwe" li wir damezirandîye, û Mûsil jî dikeve navê, ku ji destê Tirkîyê girtibûn, li wî welatî sîyaseta dagîrkarîyê derbaz dike û ew yek dibe sebeb, ku kurd gelek cara serî hildidin, lê ji alîyê împêrîyalîzma Brîtanîyayê bi alîkarîya tanka û bombebarana bi hovîtî têne hincirandinê.

Dema maqûl Jûzê rewşa kurdên Îraqê himberî rewşa kurdên Azirbêcanê dikir, ji bo hinek heq-hesabên xwe, bi bêwijdanî û bêbextî derew dikirin, digotin: "Li Îraqê kurda azaya tam sitendine, li dibistanên destpêkî û navîn da dersdayîn bi zimanê kurdî ye, û jîyan û pêşketina kurdên Îraqê ji bo kurdên Tirkîyê û Farizistanê nimûneyên çevdayînê ne. Bal me heta elfaba kurdî jî tune, û gelo ewê hebe,- Jûzê derewên xwe berdewam dikir,- ew hela pirs e. Lê îngilîs bona kurdên Îraqê gelek tişt dikin. Li her wezîretekê da kurd hene" û h.w.d.

Em çi bêjin: ji xeberdana maqûl Jûzê em texmîn dikin, ku ew temba împêrîyalîzma Îngilîs di wî welatî da pêk tîne, ku sosîyalîzmê çê dike, li welatekî usa da, ku di nav mileta da aşîtî saz kirîye û her tişt dike bona çanda miletîyê gulvede û pêşda here. Lê di nav derew û buxdanên maqûl Jûzê da, ku ewî li ser sîyaseta miletîyê ya dîwana Sovêtîyê da barandîye, rastî jî hebû, ku heta meha çileya pêşin sala 1930î li Azirbêcanê dibistanên kurdî yên bi zimanê dayîkê tunebûn.

Lênîn em hîn kirine guh bidne ser gotinên dijminên me yên çînî. Em binhêrin çika ewî di nav xeberdana xwe ya derheqa karê KN PK (p) li kongrêya partîyê ya

11a da derheqa fikrên Ûstryalov da çi gotîye: "...Ez ser wê bawerîyê me, ku ew Ûstryalov bi wan gotinên xwe va kareke mezin dide me. Em gelek cara derheqa derewên komûnîstîyê yên şîrin da dibihên, û ji wê yekê madê me li hev dikeve, heta em gelekî ber xwe jî dikevin"... "Lê ew gelekî kardar e, ji ber ku ew ne tenê duberekirina gotinên vala ne, ku timê li der-dorên me ber guhê me dikevin, lê ji wê yekê em rastîya dijminên xwe yên çînî dibihên"... Û wê şûnda, gava Vladîmîr Îlyîç bi kûrayî li ser gotinên Ûstryalov disekine, destnîşan dike, ku "dijmin bi wan gotinên xwe wê xeterê nîşanî me dike, ku pêş me sekinîye"(8).

Aminayî û bawerîya mezin hindava kar û barên Şoreşa Oktobirê û zureta wê - dîwana Sovêtîyê, ku hemû xebatkarên kolonîyayên qeyserîyê yên zêrandî dîyar dikin, di nav wan da piranîya xebatkar û gundîyên kurd jî (9), alî wê yekê kirin, ku kurdên herêma Kurdistana berê ya li Azirbêcanê, belabûn û hukumê zimanê turkî li ser jîyana xwe ya rojane, di nav wê da xwendina li dibistanên bi zimanê turkî heta sala 1931ê, hesab dikirin tiştekî lazim, ku tesîra xwe ya erênî li ser pêşdabirina kûltûra wan dike.

Ev yek ji hemû dema zêdetir xeter bû, ji ber ku di van şerta da dikaribû rengê miletîyê bixeyîrîya û unda bibûya, asîmîlebûn zêde bibûya û evê li ser riya pêşketina gelê kurd ya di hemû wara da bibûya asteng, ew dikaribû pêşketina sosîyalîzmê jî berbend bikira û nerazîbûna kurda dikaribû bibûya bingeh bona dijminên me di rexnekirinên xwe yên hindava me da bi ser ketana.

Xetera here mezin di wê yekê da bû, ku prînsîpa Lênînîyê ya sereke dikaribû biteribîya (bi ser neketa), gorî kîjanê "tiştê herî sereke di nav bolşêvîzmê û şoreşa Oktobirê da ew e, ku wan kesa bikine nava sîyasetê, yên ku di dema kapîtalîzmê pirtir bindest bûn û hatibûne zêrandinê".

Daşnak jî di hindava xwe da ji bo armancên xwe yên dijî şoreşê, dibêjin, ku ermenî û kurd bi xwînî gelekî nêzîkî hev in. Wek mînak, di nav gazîya KN ya Partîya "Daşnaksûtyûn" ya li Misrê da bi vir-derewên mayîn ra tevayî, tê gotinê: "Kurd cînarên me ne, bi me ra tevayî li ser axekê dimînin, di hêla xwînî da jî em merivên hev in"... Gelo ev segbav ne ji bo wê yekê "evê merivatîyê" tînine meydanê, ku bi alîkarîya wê bikaribin mafê xwe yê zordestîyê li ser kurda zêdetir bikin û feqîrên kurda bixapînin.

Ku

Problêma kurda li Azirbêcanê

Sala dawî di karê qewînkirina xebata kûltûrî ya bi zimanê dayîkê di nav miletên kêmjimar da, ku li ser axa Azirbêcanê dimînin, sala sereke ye. Xwesma ew yek derheqa kurdên Azirbêcanê da ne.

Şêwrdarîya miletên kêmjimar, ku di hezîrana sala 1931ê li komara Azirbêcanê hate derbazkirinê, bi ciddî li ser xebata di nav kurdan da sekinî, gelek biryarên ciddî qebûl kirin û piranîya wan hatine pêkanînê. Komên dibistana yên destpêkî îdî bi zimanê zikmakî ne, û heta sala xwendinê ya sala 1933-/34an, hemû dersxane wê derbazî xwendina bi zimanê dayîkê bin.

Bona amadekirina mamostayên kurd di mehên havînê yên sala 1931ê rex zanîngeha Şûşîyê ya mamostatîyê kûrs hatibûne vekirinê. Zûtirekê wê rex zanîngeha Şûşîyê ya mamostatîyê para kurdî jî vebe. Tîpên kurdî yên latînî hatine çêkirinê bona hemû kurdên Pişkavkazê. Bi zimanê kurdî sê pirtûkên dersa hatine çapkirinê û h.w.d. Rêxistinên navça hatine agahdarkirinê, ku zêde guh bidne xwendina bi zimanê kurdî. Biryar hatîye qebûlkirinê, ku li herêma Naxçiwanê û çend navçeyên Laçînê di cîyên kar da bi zimanê kurdî bipeyîvin, civînên partîyê û komsomola bi zimanê kurdî derbaz bikin. Ew şaşîyên ku Komîtêya Perwerdeya Gelî berê (heta sala 1930î) di hêla pêkanîna sîyaseta miletîyê ya Lênînîyê da berdane, niha têne rastkirinê. Partîya Komûnîstîyê ya Azirbêcanê bi serokatîya Komîtêya Navbendî ya PK Azirbêcanê di şerkarîya dijî şovînîzmê, ku xetera here mezin e, di şerkarîya dijî nasyonalîzmê, ku bi dilê întêrvênsîyonîstan e, gihîştîye serketinên mezin, herweha di xebata di nav kurda da jî.

Bermayên mûsafatîsta bi dilekî kul di prêssa şaristanîyê da nivîsîne (kovara "Bîldîrîş", çirîya paşin, sala 1931ê): "Bona kurdên, ku bi jimara xwe va ji 6-10 hezara ne zêdetir in û tu zimanekî jî nizanin, xênji zimanê tirkî (vira jî nikaribûn derewa nekin.- A.B.) zimanekî din ji wan ra çê kirine, bi herfên cihê, bi dibistan û çande û h.w.d.".

Mûsafatîst ne şaş bûn. Û eger di wî alî da em hela tam bi ser neketine, lê me ew kar danîye pêş xwe û emê pêk bînin.

Bi wê yekê ra tevayî biryar kirine li herêma Naxçiwanê kurda derbazî jîyana riatî bikin, ku ew bere-bere dest ji jîyana koçerîyê bikişînin, tivdîra kolêktîvîzasyonê dikin, ku xebateke ciddî û demdirêj dixweze. Pere hatine berdanê bona di navça Erezdeyanê da gundekî kurda yê şên çê bikin, bi dermanxanê, wargên qenckirina binecîya, dibistana, dergûşxana û baxçên zara û dayîrên civakî-çandî yên mayîn va. Tiştek ber çeva ye, ku xebata di wî alî da hela bi zerpa bolşêvîstîyê neketîye qamê xwe.

Rêxistinên partîyê û Sovêtîyê yên navçeyên herêma Kurdistana berê (Laçîn, Kelbecar, Kubetli) û xwesma jî KSS Naxçiwanê gerekê bi zerpeke mezin xebata di nav kurda da, ku destpê bûye, pêşda bibin, û di wî alî da gerekê xusûsîyetên gel bidne ber çeva, derkevine dijî dijminên çînî, cûrê jîyana eşîrtîyê (rîspîtî, heyfhildana xwînî, seîdî li herêma Naxçiwanê û h.w.d.), ku li van dera hetanî niha jî xurt e.

Derheqa vê yekê da di biryarên KN ya PK Yekîtîya Sovyêt da hene, ku ewê 23ê hezîranê sala 1929a qebûl kirine û piranîya wan jî derheqa rewşa rêxistinên partîyê yên Azirbêcanê da ne. Em binhêrin çika di wê biryarê da çi tê gotinê: "Eşîrtî heta niha jî kokbir nebûye, ji ber ku şerkarîya dijî wan sist e.

Hetanî niha jî gundîyên feqîr di dest milkedara û serekên dînî da dizêrin, çimkî me guhdarîya lazim ne danîye li ser pirsên guhartina cûrê jîyana wan".

Pêkanîna van daxazên KN ya PK Yekîtîya Sovyêt ji bo navçeyên kurda jî pir giring in, û rêxistinên partîyê û Sovêtîyê gerekê di nav kar û barê xwe da guhdarîke mezin bidne ewê pirsê.

Organên di cîya da bi xebitandina dewlemendtîyên binerd û zêdekirina deranîna wan navça, çêkirina riya, bi aqilane teşkîlkirina xebata di kolxozan da û sazkirina kolxozê nû ra tevayî, gerekê bikaribin hukumê partîyê li ser gundîyên kurd bidne zêdekirinê, wana bikine endamên partîyê û komsomolê, karê perwerdeya întêrnasyonalîstîyê di nav xebatkarên wan navça da pêş bixin û xebata di nav jina da jî xurt bikin, ku hetanî van demên dawî jî hema bêje tunebû û h.w.d. Biryarên KN ya PK Yekîtîya Sovyêt ya 31ê çirîya paşin sala 1931ê rêyên fire vedikin bona çêkirina sosîyalîzmê li Pişkavkazê, xwesma jî di hêla xebata di nav gelên kêmjimar û hilanîna nexwendîtîyê di nav wan da.

Bi saya serê sîyaseta miletîyê ya Lênînîyê "problêma" kurda li Azirbêcanê tê çareserkirinê. Rast e, wî alî da em ji Ermenîstanê gelekî şûnda mane.

Ew xebata mezin, ku Ermenîstana Sovêtîyê kirîye di hêla sazkirina zanîngeha Pişkavkazê ya ji bo amadekirina mamostayên kurd, çapkirina pirtûkên kurdî, ronahîdîtina rojnama "Rya teze", amadekirina kadroyên kurd bona di rêxistinên partîyê û civakî kar bikin û h.w.d gerekê ji bo me bibine nimûneyên çavdayînê. Û ev hemû ne tenê ji bo kurdên Pişkavkazê giring in, lê herweha ji bo kurdên dervayî welatê me jî. Di nav deh salên heyetîya Fêdêrasyona Komarên Pişkavkazê yên Sovêtîyê da kurdên Azirbêcanê, Ermenîstanê û temamîya Pişkavkazê bi piştgirîya Rûsîyayê û tevaya Yekîtîya Sovêtîyê ya întêrnasyonal, di hemû alîyan da gihîştine

serketinên mezin, temamîya kar û jîyana xwe derbazî li ser riya sosîyalîstîyê dikin. Kurdên Pişkavkazê bi serokatîya Partîya Komûnîstîyê cara pêşin di nav dîrokê da tîpên xwe yên li ser bingeha herfên latînî saz kirin, pirtûka diweşînin, dibistan û zanîngehên bi zimanê xwe vedikin, kadroyên xwe amade dikin, nexwendîtîyê didine hilanînê, bi miletên Pişkavkazê yên mayîn ra tevayî mil dane milê hev, di maleke întêrnasyonal da kolxoza çê dikin, dest ji cûrê jîyana eşîrtîyê dikişînin, bi milkedar û zordestên "xwe" û yên "xelqê" ra şerkarîyê dikin û ji bindestîyê rizgar dibin.

Femdarî ye, ku emê bi van serketina va hêsa nebin û emê diha pêşda herin.

Hevalê Stalîn li kongrêya partîyê ya XVIa da gotîye, ku "gerekê her tiştî bikin bona kûltûra mileta pêşda here û gulvede, usa bikin, ku hemû kûltûra di nav hev da bihelin û bibine yek kûltûr û yek ziman. Gulvedana kûltûrayên bi cûrê xwe yên miletîyê, bi naveroka xwe yên sosîyalîstîyê di şertên dîktatûra prolêtarîyê di hundurê welatekî da dikarin bibine yek kûltûr - ya sosîyalîstîyê (him bi cûrê xwe, him jî bi naveroka xwe) bi zimanekî tevayî û ew daxazên me wê wî çaxî bi ser kevin, gava prolêtarîat di temamîya cihanê da bi ser keve û li her dera sosîyalîzm be - a hema ev e bingehê dîalêktîka Lênînîyê ya derheqa pirsa kûltûra miletîyê da"**(1)**.

Troskîstekî bi navê Vahanyan, ku "têorêtîkekî" şovînîst bû û ser wê bawerîyê bû, ku di dema dîktatûra prolêtarîatê kûltûra miletîyê nikare pêşda here û kurda himberî çerkeza dikir, ango wan nimz didît, di dema xwe da nivîsîye: "eger kurda tiştek nedabana medenyata dinyayê û tenê sitiranên xwe yên hesîntijî dabana, eger tiştek nedabana xênji reqasên xwe yên çapik û çeleng, ew tenê jî bes bûn, ku em bêjin kurda keda xwe kirine di nav kîlera îdêayên prolêtarîyata întêrnasyonalîstîyê ya navnetewî"**(2).**

Vahanyan û kesên wek wî, ku derdiketine dijî sîyaseta partîyayê ya derheqa pêşdabirina kûltûra gela ya bi cûre xwe va miletîyê, lê bi naveroka xwe va jî ya sosîyalîstîyê, bi fikir û kirinên xwe va pêşketina kûltûrayê di dema dîktatûra prolêtarîatê da berbend dikirin.

Vahanyan fêm nake, ku "tenê di demên dîktatûra prolêtarîatê û çêkirina sosîyalîzmê di Yekîtîya Sovêtîyê da kûltûrayên miletîyê dikarin pêşda herin", û ew pêşdaçûyîn bi saya serê şoreşa kûltûrîyê dikare bi ser keve, ya ku ji bo gelên ku berê paşketî û bindest bûn, rêyên fire vedike. A di van şerta da çanda kurda dikare gulvede, lê ne ku bi cûrê, ku Vahanyan pêşnîyar dike.

Sîyaseta me ya rast di pirsa miletîyê da, ku bi serokatîya Partîya Komûnîstîyê ya Yekîtîya Sovêtîyê tê meşandinê, bi dilê hemû gelên bindest yên Yekîtîya Sovêtîyê û xebatkarên cihanê ye.

Evê yekê dijminên me yên çînî jî yên ji Întêrnasyonala IIa nikarin texmîn nekin. Bi vê yekê ra girêdayî xeberdana A.Cemalyan - dêlêgatê ji partîya "Daşnaksûtyûn" - derheqa pirsa kurda da ya li civîna serwêrtîya Întêrnasyonala IIa da, ku 20-25ê tebaxê sala 1930î li Zyûrîxê derbaz bû, gelek balkêş e. Xût ew Cemalyan eva çendik

çend sal e di civînên Întêrnasyonala IIa da bi sipartin û wekîltîya partîya şêx û derebegên kurda - "Xoybûn"ê, ku di payîza sala 1927a hatîye damezirandinê, rola navçîgar û "parastvanê" kurda dileyîze**(3)**.

Em bala xwe bidnê çika nûnerê sosîyal-împêrîyalîzma Îngilîs Brokwey li civîneke wê da çi gotîye: "Pirsa kurda, ku îro em li ser disekinin, careke mayîn dide xuyanîkirin, ku Întêrnasyonala me nikare guh nede ser tevgerên gelên rohilatê. Gava min ra firsend çê bûye, min çend cara derheqa vê yekê da gotîye. Min usa jî daye xuyakirin, ku di wî alî da Întêrnasyonala IIIa pêşîya me ketîye. Ez jî wek gelekên ji we, ser wê bawerîyê me, ku Întêrnasyonala IIIa bi pirsên qedera miletên biçûk ra mijûl dibe, lê ne hertim daxazên wan dide ber çevan. Lê di nav wan gelan da hurmeta wê gelek e, ji ber ku ew guh dide daxazên wan û hewl dide wana pêk bîne".

Lê ew pirsa, ku Întêrnasyonala IIIa xudêgiravî ew hemû tişt ji bo berjewendîyên xwe dike, ez ne pê ra me. Tecrûbeya çareserkirina pirsa miletîyê li Yekîtîya Sovêtîyê û mêlkêşîya (sîmpatîya) gelên bindest û nîvbindest hindava welatê ku sosîyalîzmê çê dike, ku wetenê prolêtarîata navnetewî û gelên cihanê yên bindeste tek-tenê ye, roj ser rojê diha zef xebatkar û gundîyan li dor xwe dicivîne û dike bin ala şoreşê, bin ala Komîntêrnê - ev hemû didine xuyakirin, ku berjewendîyên rasteqîn kîjan in û qîmetê gotinên usa çi hêja ne.

Dijminê çînî heta wî çaxî jî nikare derewa neke, gava ew rastîyê dibêje.

Lê ji vê zêdetir jî xwemukurhatina eşkere û pesinandina Întêrnasyonala IIIa û sîyaseta PK Yekîtîya Sovêtîyê ji alîyê casûsekî bûrjûazîya împêrîyalîstîyê ya navnetewî di nav çîna karkir da, nabe.

Hemû xeberdanên tevgelên ewê civînê û ji alîyê civînê da qebûlkirina rêzolyûsyona derheqa pirsa kurda da vik û vala bûn.

Dema di civînê da pirs hate ser bûyerên Kurdistana Tirkîyê, civînê bi zarê (zimanê) nûnerê sosîyal-faşîzma navnetewî Rênodêyl (Fransîya) mecbûr bû bêtaqetîya (bêçaretî) xwe nîşan bide. Em binhêrin çika Rênodêyl derheqa wê pirsê da çi got:

"...Ez nikarim hindava gotineke dê-Bryûkêr (serekê ewê civînê.- A.B.) da bêdeng bimînin, ku derheqa Koma (Yekîtîya) Mileta da ne. Bi gotinên wî em nikarin bangî Koma Mileta bikin, ku ew tevî pirsa kurda bibe, ji ber ku berî her tiştî ew bê dewlet e, ku me bikaribûya Koma Mileta mecbûr bikira li ser pirsa kurda bisekinîya; lê eger Kurdistan dewlet bûya jî, Koma Mileta nikaribû Tirkîyê mecbûr bikira biryarên wê pêk bîne, ji ber ku Tirkîya ne di nav Koma Mileta da ne.

Çi dertê? Usa dertê, ku rêxistina ji weke 50 dewleta, ku xwedî gelek gotar û biryarên derheqa parastina gelên bindest da ne, nikare dewletekê mecbûr bike (dewleta ku nakeve di nav Koma Mileta da) qira (gelkujî) miletekî kêmjimar, ku di bin hukumê wê da ne, bide sekinandinê".

Dê-Bryûkêr ji cîyê xwe wek rêplîk dibêje: "Mixabin, rastî ev e". Dû ra Rênodêyl gotina xwe berdewam dike: "Ez wê rastîyê zanim û zanim ku usan e, lê nikarim

pê ra qayîl bibim. Ji ber wê jî pêşnîyar dikim, ku komîsyona me, ku hatîye sazkirinê bona guhartina bike nava bernama Koma Mileta, bira ev rewşa kurda ya xirab bide ber çeva, eger usa nebe, Koma Mileta wê di çevê hemû merivên bi dilê qenc da reş bibe"**(4)**.

Întêrnasyonala IIa tiştek qebûl ne kir, ji ber ku ew di zû da perçekî Koma Mileta ye, perçekî împêrîyalîzma navnetewî ye, ji ber ku sosîyal-dêmokratîya dijî şoreşê ya navnetewî di zû da "propogandîsteke Koma Mileta ya împêrîyalîstîyê ye, ku kapîtalên (perên) cihanê hûfî xwe dike û hazir dibe bi hêza xwe êrîşê bibe li ser dîktatûra prolêtarîatê li Yekîtîya Sovêtîyê (Kaûtskîy, Gîlfêrdîng)"**(5)**.

Hema di wan dema da împêrîyalîzma Îngilîs bi hajpêhebûn û dilxwezîya Întêrnasyonala IIa tivdîrê dibîne êrîşê bibe ser welatê Sovêta û bingeheke ewê êrîşê jî gerekê "Kurdistana serbixwe" ya bin bandûra Îngilîs da be, û ew kar *di zû da* tê amadekirinê û van axirîya jî ji alîyê barêgeha Îngilîs ya sereke da bi awakî eşkere pêşda hate kişandinê.

Em guhdarîya we datînine li ser gotina *di zû da,* ji ber ku hinek lêkolîner (yek ji wan V.Gûrko-Kryajîn e) ji dilsaxîya xwe ser wê bawerîyê ne, ku îdêya "Kurdistana serbixwe" tenê di rûyê şerê hemcihanê da pêşda hatîye. Lê ya rast ew e, ku di peymana Sêvrê da ya 10ê tebaxê sala 1920î xalên taybetî hebûn (xalên 62, 63 û xwesma jî ya 64a) derheqa sazkirina Kurdistana otonom da, û ew yek jî rast e, ku bi saya serê şerê serketî yê Tirkîyê yê miletîyê-azadarîyê ew peymana xelet ji holê rabû û dû ra jî peymana aşîtîyê ya Lozanê hate qebûlkirinê (16ê tîrmehê sala 1923a) û li wir derheqa kurda da tu gotinek jî tune. Lê hela berî şerê hemcihanê ew îdêya hebû û di hêlekê da împêrîyalîstên rûs û îngilîs ew derdixistine holê, û her yek ji wana hewl dida bi karanîna mesela kurda di nerazîbûnên di navbera xwe da bi ser keve, di hêleke mayîn da jî ew bi kar dianîn himberî Almanîyayê, ji ber ku ewê destpê kiribû riya Bexdadê ya xeta hesin çê dikir û hewl dida bi awakî lez û bez xwe berde nav Rohilata Nêzîk.

Derheqa van yeka da bi awakî zelal di nivîsên Soane, Mînorskî û çawîşê barêgeha sereke Bêngzêr**(6)** û yên mayîn da têne ber çeva.

Em bala we bikişînine ser Soane, ku me berê derheqa nivîsên wî da ji we ra gotîye, yê ku ne tenê pûblîsîst û kurdzan bû, lê herweha di pirsa kurda da êmîsarekî (qasidekî) împêrîyalîzma Îngilîs yê herî aktîv bû li Rohilata Nêzîk. Xudanê nivîsa derheqa jînenîgarîya Soanê rehmetlêbûyî - A.Wîlson, ku derheqa karê wî yê di wî alî da dinivîse, wê xebata wî ya pir tîne ber çeva û wê yekê karê wî yê sereke dihesibîne, ku ewî ji sala 1908a destpêkirî di seredanên xwe yên li Kurdistanê da kirîye.

Wîlson dinivîse: "Piranî bi saya serê xebata wî bû, ku di nav gelek mehên sala 1920î da li Kurdistana Başûr tu tevlihevî çê nebûn, lê di eynî wextê da di navçeyên ereba da serhildanên cuda-cuda dibûn". Çend xet jorî van gotinan, hema ew Wîlson, ku wekîlê hukumeta Îngilîs bû li Mêsopotamîyayê, dinivîse, ku "sîyaseta Soane pir kardar bû û ew sîyaset ew daxazên Îngilîs pêk dianîn, ku ewê soz dabû Koma

Mileta bi serxîne û derheqa wê yekê da di xala 22a ya peymana di navbera wan da hatibû destnîşankirinê"**(7).**

Em bikine bîra we, ku bi wan "sozdayîna" împêrîyalîzma Îngilîs gerekê Mêsopotamîya zevt bikira. Di wî alî da ewê gava pêşin kiribû - qiralîyeta Îraqê kiribû bin bandûra xwe. Îngilîs bi razîbûna bê deng ya Întêrnasyonala IIa hewl dida paşdemê da perçekî Îraqê, ku kurd lê diman, jê biqetîne û bike bingehê Kurdistana "serbixwe", ku wana berê da plan kiribû saz bikin.

Împêrîyalîzma Îngilîs-Fransîyayê piştgirîya Întêrnasyonala IIa tam bi kar tîne, bi deha alayên xwe dişîne bona hincirandina serhildanên gelên bindest, di nav wan da yên kurda jî, ji ber ku ew serhildan ji bo împêrîyalîzmê xeter in.

Îngilîs û Fransîya hêrs û nerazîbûna kurda hindava Tirkîyê, Farizistanê, Îraqê, ku wana dizêrînin, tam bi kar tînin, gelek cara helana didine kurda bona ew êrîşî li ser wan welata bikin, bona paşê bikaribe şertên xwe li situyê wan welata bialîne seba ewana paşê di hêla aborî û sîyasî da ber wê da berdaxwerina bikin.

Xweserîtî û zordestîyên dewletên Tirkîyê û Farizistanê hindava kurda da, berîhevdana eşîrên kurda, rakirina koçerên kurd himberî gundîyên riat, zêrandina ji alîyê milkedar û dewlemendên kurda da - ev hemû dibûne sebeb, ku kurd serî hildin, bona rizgarbûnê şer bikin.

Ji salên 40î destpêkirî û xwesma jî ji salên 50î yên sedsala XIXa, dema kurda bi serokatîya Bedirxana (di salên 1943-1946a da) cara pêşin bi ciddî serî hildan, û dû ra jî, di dema şerê Qrîmê di sala 1855a ya bi serokatîya Yezdanşîr, di salên 1877-1878a di dema şerê Rûsîyayê-Tirkîyê serhildana bi serokatîya lawên Bedirxana, di sala 1880î serhildana Şêx Ubeydulle û yên mayîn û heta rojên îro (serhildanên sala 1925, 1929a, 1930î) Kurdistana Tirkîyê û Farizistanê bi serhildanên kurdên bindest û zêrandî va kimkimî bû.

Ev serhildan, xwesma yên van salên dawî li Tirkîyê (di salên 1925, 1930î) carna rengê kevneperstîyê werdigirtin, ji ber ku serokatîya wan di destê derebegan da bûn, yên ku bi piranîya xwe va casûsên împêrîyalîzmê bûn.

Lê gelê kurd di şerkarîya xwe ya ji bo azadîyê da zû an dereng wê berê xwe ji navçîgarên (orteçî) ji Întêrnasyonala IIa, berî gişka jî ji nûnerên partîya ermenîya ya bûrjûazîyê "Daşnaksûtyûn" biguhêre, ya ku zû da bûye berdevka împêrîyalîzma Îngilîs-Fransîyayê û rola qehba sîyasî dilîze. Gelê kurd dikare bi şerkarîya dijî împêrîyalîzma navnetewî û berxwedana himberî zordestên "xwe" û yên "der" problêma xwe hel bike, lê ne ku bi alîkarîya Întêrnasyonala IIa û casûsên dijî şoreşê yên ji partîya "Daşnaksûtyûn", ku xwe wek parastvanên kurda nîşan didin, lê eslê xwe da ewana her tişt ji bo berjewendîyên xwe dikin.

Zordestî û zêrandinên qiralîyetya Rûsîyayê ya eskerî-derebegî, hukumê mûsafatîsta û daşnaka ya demkurt li ser Pişkavkazê, ku xulamokên împêrîyalîstên Îngilîs bûn, rind di bîra kurdên Azirbêcanê û Pişkavkazê da maye.

Îro qarîn-barîna tu dêmagog û şerletanên ku xwe wek parastvanên gelê kurd nîşan didin, nikarin ew rojên reş û bi xwîn ji bîra kurda derxin, ku di salên 1919-1920î bi destî cerdvanên daşnaka û mûsafata anîne serê kurdên Azirbêcanê, herêma Naxçiwanê û Ermenîstana Sovêtîyê.

Pêşketina sosîyalîzmê li Yekîtîya Sovêtîyê û ew yek, ku Fêdêrasyona Pişkavkazê dibe komara sosîyalîstîyê ya berbiçev di Rohilatê da, nîşanî hemû cihanê dike, ku xebatkarên Pişkavkazê çawa di heyra hevdu da nin û wek bira bi hev ra dijîn. Û "ev yek nikaribû di dema bûrjûazîyê da hebûya" (Lênîn). Li welatê Sovêtîyê dereca kûltûrayên miletîyê pir bilind bûye, gelên ku berê bindest bûn, îro ketine li ser riya bextewarîyê û xweşbextîyê, di nav wan da kurdên Pişkavkazê jî. Û hema ev yek gerekê ji kurdên dervayî xeta sor (dervayî Sovêtîyê) ra bibe delîl, ku eger împêrîyalîzma cihanê êrîş bibe li ser welatê me, ku bi serketin sosîyalîzmê çê dike, pişta xwe bi kê va girêdin.

1. **Î.Stalîn. Hesabdayîna sîyasî ya Komîtêya Navbendî ya PK Yekîtîya Sovêtîyê, rûpel 76.**
2. **V.Vahanyan. *O nasyonalnoy kûltûrê* (*Derheqa kûltûra miletîyê da*), GÎZ, 1927, rûpel 187.**
3. **Derheqa wê pirsê da di kovara *Bolşêvîk Zakavkazya*, hejmar 2, ya sala 1931ê (rûpel 37-42) gotara Akopov bi zimanê rûsî çap bûye ya bi sernivîsara *Kûrdskîy vopros î daşnakî* (*Pirsa kurda û daşnak*).**
4. **Xeberdanên Rênodêyl û Brokwêy ji kovara daşnaka ya bi navê *Droşak* (çirîya paşin û çileya pêşin sala 1930î) hatine hildanê.**
5. **Ji bernama *Întêrnasyonala Komûnîstîyê*, GÎZ, sal 1928, rûpel 23.**
6. ***Sbornîk gêografîçêskîx, topografîçêskîx î statîstîçêskîx matêrîyalov po Azîî. (Berevoka nivîsên gêografîyê, topografîyê û statîstîkîyê derheqa Asîyayê da)*, hejmar 84, sal 1911, nivîsa *Zapîskî o Kurdîstanê* (*Bîrannên derheqa Kurdistanê da*).**
7. **E.B.Soane, *To Mesopotamia and Kurdistan in disguise*, p. XV.**

Pirtûka A.Bûkşpan û qedera kurdên Azirbêcanê

Şekroyê Xudo

Akadêmîk, doktorê dîrokê, profêsor

Sala 1931ê rohilatzan-kurdzanên Azirbêcana Sovêtîyê ya berê li herêma Kurdistanê û warên komara Azirbêcanê yên mayîn da, ku kurd lê diman, êkspêdîsyoneke dîrokî-êtnografî pêk anîn. Armanc û pirsdanînên ewê êkspêdîsyonê di pêşgotina pirtûka A.Bûkşpan ya bi sernivîsa "Kurdên Azirbêcanê" da cî girtine. Meriv dibê qey ev tiştekî xêrxazîyê ye û ev kar gorî wê sîyasetê hatîye kirinê, ku dîwana Sovêtîyê hindava gelên kêmjimar da, di nav wan da kurda jî, derbaz dikir.

Di çarçova wê sîyasetê da, ku dewleta Sovêtîyê îlan kiribû bona pê bihese çika miletên kêmjimar di çi rewşê da nin û bona qedirgirtina mafên wan yên êtno-kûltûrî, li herêma Kurdistanê (bi biryara dewleta Azirbêcanê ew ji sala 1923a wek otonomîya kurda hatibû îlankirinê) çend êkspêdîsyonên êtnografî hatine derbazkirinê. Gorî malûmatîyên, ku ketine destê me, wan çaxa du êkspêdîsyonên usa hatine derbazkirinê. Ya pêşin di sala 1929a bi serokatîya profêsor V.A.Gûrko-Kryajîn hate derbazkirinê, ku bi gotarên xwe yên derheqa tevgera kurda û pirsa kurda da, ku tê da gelek nerastî hebûn û bi ruhê wan dema hatibûne nivîsarê, "deng dabû". Serokê êkspêdîsyona duda xudanê evê pirtûkê A.Bûkşpan bû. Endamên vê êkspêdîsyonê ev kes bûn: dilxwazê kurda yê mezin

Î.Morogûlovê aşûrî, ku ji Ermenîstanê bû, mamostayê zimanê kurdî Samed Şahsûvarovê ji gundê Mînkendê, navça Laçînê û yên mayîn.

Gelo ev ekspêdîsyon çi dan, gelo ew rewşa civakî-kûltûrî ya kurdên Azirbêcanê, ku piştî wan ekspêdîsyona endamên wê raxistine ber çevan, çawa bû? Derheqa ekspêdîsyona pêşin da em vê yekê dikarin bêjin: merî dikare xebatên Gûrko-Kryajîn yên salên 20-30î rexne bike, ji ber ku kil û kêmasî tê da hene, lê tu kes nikare înkar bike, ku ew bi profêsyonalî hatine nivîsarê û ew derheqa kurda da xwedî zanebûnên pir e. Bi vê yekê ra girêdayî merî dikare texmîn bike, ku berhem û lêkolînên wî gerekê balkêş bûna. Wek xuya ye, ew balkêşî bûye sebeb, ku nivîsên wî "betavebûne" ("unda bûne"), ji ber ku ew nivîs, wek yên ku piştî derbazkirina ekspêdîsyona duda ya bi serokatîya A.Bûkşpan hatine nivîsarê, dikaribûn rewşa kurda û çanda wan bi awakî zelal banîyana ber çeva û li ser wê bingehê jî gerekê pirsgirêkên pêşdabirina çanda wan çareser bikirana û rewşa wî miletî bidana xweşkirinê. Lê di wan dema da ev hemû îdî nedihate hesabê azirîyan.

Çima? Ji ber ku îdî dem ne ew dem bû, sîyaseta nû berê xwe ji kurdên Azirbêcanê guhartibû.

Rast e, pirtûka Bûkşpan "Kurdên Azirbêcanê" bi gelek şaşî û kêmasîyan va dagirtîye, lê ew bi wê yekê va balkêş e, ku pirî-hindikî dêmê (bengz, rû) herêma Kurdistanê tîne ber çeva, tê da malûmatîyên hewaskar hene derheqa jimara kurda, rewşa wan ya civakî-aborî da.

Bîr û bawerîyên xudanê pirtûkê, cûrê analîzkirina lêkolînên wî yên derheqa kurda da bi ruhê wê demê va hatine nivîsarê û raberkirinê. Ewî hemû îzbatîyên bin destê xwe da yên derheqa kurda da bi lûla "pêvajoya şoreşgerîyê ya hemcihanê ya bin ala Marksîzm-Lênînîzmê" ra derbaz kirîye.

Sîyaseta "piştgirîya gelên bindest", ku dewleta Sovêtîyê îlan kiribû, ser kurda derbaz nedibû, ji ber ku pêwendîyên dostanîyê bi Tirkîya kemalîstîyê û daxaza, ku seba xatirê kurda pêwendîyên xwe bi Îranê ra xirab nekin, bûne faktorên sereke di sîyaseta Sovêtîyê ya hindava kurda da.

Gerekê bê destnîşankirinê, ku bi tevayî li Yektîya Sovêtîyê di sîyaseta dewletê ya hindava gelên kêmjimar da gelek xalên baş hebûn. Kurdên Sovêtîyê jî bona pêşdabirina çanda xwe ji wê sîyasetê karê ketin. Di vî karî da pirsa derheqa kurdên Azirbêcanê da cîkî giring digire. Derheqa wan da emê li jêr ji we ra şirove bikin.

Giringî û qîmetê pirtûka Bûkşpan di wê yekê da ne, ku ew bi îzbatî, malûmatîyên statîstîkîyê û lêkolînên xwe va, ku endamên ekspêdîsyonê di dema karkirina xwe ya li navçeyên kurda yên li Azirbêcanê berev kirine û amade kirine, alî me dikin, ku em pê bihesin çika berî pêkanîna sîyaseta helandinê hindava kurdên Azirbêcanê da rewşa kurda li wira çawa bûye.

Bona ev problêm bi awakî zelal bê ber çeva, pêwîste qe na em bi kurtî dîroka kurdên Azirbêcanê bînine ber çeva.

Di salên Perestroykayê (Daçêkirinê) û, xwesma, di salên piştî wê da pirsa derheqa hal û demên kurdên li Komara Sovyetî ya Sosîyalîst (KSS) Azirbêcanê ji alîyê dîrokzana, êtnografa, rojnamevana û mexlûqetzana da, him li Yekîtîya Sovyet, him jî li welatên din bû têma minaqeşekirinê. Hewaskarîya ewqasî mezin hindava bext û qedera kurdên Azirbêcanê da bi çi va girêdayî bû? Kurdên Sovêtîyê, ku li vî welatî ji miletên kêmjimar bûn û perçekî miletê kurdî pirmîlyonê bûn, di kontêksta himberîhevkirina rewşa wan bi rewşa giran ya birayên wan li Kurdistanê, bala pêşekzana dikişand. Lê di goveka (çarçova) wê hewaskarîyê da pirseke giring jî hate holê: ferq û cudatîyên mezin di navbera kurdên Azirbêcanê û kurdên Sovêtîyê yên mayîn da (ji bo nimûne, Ermenîstanê û Gurcistanê). Û tiştê herî ecêbmayînê jî ew e, ku gilî derheqa wargê êtno-sîyasî yê yekgirtî - welatê Sovêtîyê da ne. Li Azirbêcanê di nav demeke kurt da sîyaseta bi destî zorê asîmîlekirina gelê kurd hate pêkanînê, ku ji kurdên Sovêtîyê yên here pirjimar bûn. Ew yek çawa qewimî, çi faktorên guhêrandina strûktûra dêmografîyê li herêma ku kurd li wir ser hev dijîyan û çi firsendên sîyasî hatine bikaranînê bona pêkanîna wê armancê?

Bingeha bona bi obyêktîvî ronahîkirina ewê pirsê dikarin îzbatîyên dîrokî û malûmatîyên statîstîkîyê yên fermî bin. Em ser da zêde bikin, ku bona ronahîkirina van pirsa him fikrên komên Azirbêcanê yên fermî û piştovanên wan derheqa "bi rezadilî asîmîlebûna kurda" û him testîqkirinên çend xwedînivîsên (avtor) "kurd" derheqa "Qeza Kurdistanê ya otonom" û hela "Komara Kurda ya otonom" di teşkîla Azirbêcanê da, ku çend weşana da derketine, fikrên pûç û bê bingeh in.

Bona zelalkirina dêmê vê pirsa ku em li ser disekinin, em berê xwe bidne çend îzbatî û malûmatîyên azirîyan. Anegorî hesabkirina binecîya ya sala 1921ê tenê li gundên KSS Azirbêcanê da jimara kurda 32.780 merî bûn. (Binhêre: Şirovekirina karkirina Komîsarîyata Sovêtîyê ya Gel ya KPSSF (Komarên Pişkavkazê yên Sovyetîye Sosîyalîstîye Fêdêratîv), Tîflîs, s. 1923, rûpel 16). Di sala 1926a jimara kurda li Azirbêcanê weke 41 hezara bû (1,8% binecîyên komarê). (Binhêre: K. M. Mamêdov, Jimara binecîyên KSS Azirbêcanê di nav 60 salan da, Bekû, s. 1982, rûpel 55). Giring e bidne kivşkirinê, ku kurdên KSS Ermenîstanê û KSS Gurcistanê (xwesma êzdî) di sedsalên 19a û 20î ji dest zordestîya Tirkîyê mihacirî wira bûne, lê kurdên Azirbêcanê ji demên buhurî da li ser axa kal û bava dijîtin. Xuya ye gilî derheqa sedsalên 10 û 11an, dema hukumdarîya mîrîtîya kurda ya Şeddadîya da ne, ku temamîya wê herêmê bin bandûra wê da bû. Gerekê bê gotinê, ku hetanî nîveka sedsala 20î kurdên Azirbêcanê di jîyana komarê ya mexlûqetîyê-sîyasî da xwedîyê çend mafên miletîyê bûn.

Di meha tîrmehê sala 1923a li Azirbêcanê di eynî demê da Devera Otonom ya Qerebaxê û Herêma Kurdistanê hatine teşkîlkirinê. Bin destê me da îzbatî tunene derheqa statuya Herêma Kurdistanê da wek yekîtîyeke miletî-dewletî ya otonom. Lê dîsa jî ew yek giringîya pirsa qedera kurdên Azirbêcanê danaxîne. Gelekî giring e bidne ber hesêb, ku ew herêma ku dihate binavkirinê wek Herêma Kurdistanê, cîyê bi kompakt jîyana kurda bû, ku di navê wê da jî xuya dibe û, ya duda, di salên dîwana Sovêtîyê yên pêşin da sîyaseta dewletê ya derbarê hesabkirin jimara

miletên Yekîtîya Sovêtîyê yên kêmjimar û pêşdabirina kûltûra wan, li ser kurdên Azirbêcanê jî derbaz dibû. Tiştekî balkêş e, ku V. Î. Lênîn bi xwe guh daye ser rewşa binecîyên kurd ya xirab li wê herêmê. Ewî di têlêgrama xwe ya ser navê serokê Şêwra Komîsarîyata Gelî ya Azirbêcanê N. Narîmanov nivîsîye: "...gorîkirina 40 mîlyon pere ji bo birçîyên Povoljîyayê û Kurdistanê - îzbatîya wê yekê ya here baş e, ku em hazirin bin ala Înternasîyonala Sor da bimeşin. Serokê Şêwra Komîsarîyata Gelî ya Komarên Rûsîyayê yên Sovêtîêye Sosîyalîstîye Fêdêratîv Lênîn." (V. Î. Lênîn, "Berevoka efrandina", çapa 3a, cild 4, rûpel 100).

Lê vira pirseke nazik hebû, ku taybetîya rewşa kurdên kêmjimar dianî ber çava. Kurdên Sovêtîyê, ku beşeke gelê kurdî perçekirî bûn, hema bêje hertim tesîra rewşa sîyasî ya herêma ku kurd lê diman (Kurdistanê) ser xwe texmîn dikirin. Em bîr bînin, ku ew dema em li ser disekinin da, pirsa kurda li Tirkîyê gelek berk bû. Tiştekî eyan e, ku di destpêka salên 20î kemalîsta li Tirkîyê gelekî aktîv bi serokatîya kurda ra diketine nava pêwendîya bona xwe ji şertên Peymana Sevrê xilaz bikin, ya ku riya serxwebûna kurda vedikir. Pêşî kemalîsta derheqa wekehevtîya sîyasî ya kurda û tirka da elam kirin, hela behsa otonomîya bona kurda jî kirin. Lê piştî Peymana Lozanê (sala 1923a), ku şertên Peymana Sevrê binax kir, kemalîsta di sîyaseta xwe ya derheqa pirsa kurda da berê xwe guhastin û li soz û qirarên xwe xwedî derneketin. Nerazîbûna kurda bi wê sîyasetê ra warguhêzî serhildanê bû, ku sala 1925a bi serokatîya Şêx Sehîd destpê bû. Kemalîsta ku serhildana kurda di nava xwînê da mewicandin, elam kirin, ku Tirkîyê da ne kurd hene, ne jî pirsa kurda heye. Evê yekê tesîr li ser rewşa kurdên Azirbêcanê kir. Du faktora alî wê yekê kirin: ya pêşin, hukumata Sovêtîyê di nav pêwendîyên baş da bû bi kemalîsta ra û zanibû ku ew mafên ku Sovyetê daye kurda, ne bi dilê wan e û ne dixwest xatirê wan keve, ji ber ku kurdên birayên wan li Tirkîyê ji hemû mafa hatine mehrûmkirinê. Ya duda: Tirkîye nû ketibû heyra bext û qedera Azirbêcanê da, ku bi êtnîkî ji xwîn-qinêtekê bûn. Em wê jî bêjin, ku ewê yekê di hucetên axê yên di navbera Azirbêcanê û Ermenîstanê da rola xwe lîst û wî alî da azirî karê ketin.

Fikrên jorgotî wê pirsê ji me ra zelal dike, ku çima serokên Azirbêcanê bi rû va xwe li riya "prînsîpên întêrnasîyonalîzmê" girtibûn, lê di rastîyê da di pirsa kurda da sîyaseta bi dilê Tirkîyê bi kar dianîn. Dîwana Azirbêcanê du pirsdanîn danîbûn pêşîya xwe bona di pirsa kurda da biserkeve: a) seba xatirê Tirkîyê xwe ji otonomîya kurda xilas bike û navê "Kurdistan" ji holê rake, ku li Tirkîyê hatîye qedexekirin; b) careke mayîn vegere li ser sîyaseta xwe ya hindava kurdên kêmjimar da, usa, ku bere-bere wana bihelîne û asîmîle bike. Bona pêkanîna ewê pirsdanînê, faktora îslamê jî dihate bikaranînê, û di şertên kûltûra sîyasî ya nimiz û xwefemdarîya miletîyê ya nekamilbûyî da, dîn ser miletîyê ra bû. (Em bikine bîra we, ku kemalîsta li Lozanê bi saya serê "yekîtîya dînî ya tirka û kurda" kurda ji nav lîsta miletên Tirkîyê yên kêmjimar derxistin). Temamîya wan pirsa, ku qedera gelê kurd li Azirbêcanê va girêdayî bû, tam diketine nava wî qalibî.

Serokatîya komara Azirbêcanê sala 1930î navê "Herêma Kurdistanê" guhart û kir "Navça Kurdistanê". Lê hema di wê salê da ew navça miletîyê jî ji holê rakirin û bi

wê yekê va bingehê sîyaseta asîmîlekirina kurda, pêpeskirina (binpêkirin) mafên wan yên miletîyê hate danînê.

Eserên ewê sîyasetê bi awakî ferih (zelal) di malûmatîyên statîstîkîyê yên derheqa kurdên Azirbêcanê da xuya dibin. Li Azirbêcanê jimara azirîya her zêde dibû, lê ya kurda kêm dibû. Ji bo nimûnê, sala 1926a jimara kurda 41 hezar bû, ku dikire 1,8 % hemû binecîyên komarê, sala 1939a jimara kurda serhevdu bû 6 hezar (0,2%), sala 1959a - 1,5 hezar, sala 1970î - 5,5 hezar (0,1%), Piştî hesabkirina binecîya ya sala 1979a hate elamkirinê, ku li Azirbêcanê kurd tunene. Bona himberîhevkirinê em bidne kivşê, ku jimara kurda li komarên cînarên Azirbêcanê - Ermenîstanê û Gurcistanê ji nîveka salên 20î, ku me derheqa wê da li jorê got, 3,5-4 cara zêde bûye. Ev malûmatîyên statîstîkîyê yên fermî îzbatîyên here berbiçav in. Em wê jî bêjin, ku piranîya kurdên Azirbêcanê li gunda diman û gelek zaro dianîn. Eger em hesabeke sade bikin, em dikarin bêjin, ku niha li Azirbêcanê dikaribû 350-400 hezarî nekêmtir kurd hebûna.

Pirsa derheqa mafên kurda yên miletîyê da li vira bi cûrê xwe hel kirin: kurd tunene, tê wê manê, ku derheqa mafên wan da nikare tu xeberdan hebe. Xudanê evê gotarê ji çend azirîyên bi qulixa bilind û zanyara şirovekirinên ecêb bihîstîye derheqa "betavebûna" kurda li wê komerê da. Ewana, bi gotina wan, "bi daxaza dilê xwe asîmîle bûne". (Em bêjin, ku di hinek şerta da asîmîlebûna wî awahî diqewime. Lê çi ku derheqa "asîmîlebûna rezadil" da ne, ew têrmîneke berxwederxistî ye û bona wê ye, ku ewê yekê efû bikin, çi ku anîne serê kurda).

Bona kurda şertekî pêşketina di nav qulixa xwe da ew bû, ku bêje "ez azirî me". Bûbû qanûn, ku bona karekî baş bidne te, an jî bona sitendina navê doktorîyê û yên mayîn, kurd gelek cara mecbûr bûn di nasnameyên xwe da ber navê "miletî" xwe "azirî" binivîsin. Ev "sîyaseta hindava kurda da" ya miletçîyên azirî tenê bi van îzbatîya va kuta nabe. Ew sîyaset ya pirplan bû. Em çend îzbatî û nimûneyên mayîn bînin:

Di nîveka salên 60î beşa kurdzanîyê ya Înstîtuta Rohilatzanîyê ya Akadêmîya Zanyarî ya KSS Azirbêcanê hate dadanê, ew jî wê demê, gava problêmên lêgerîn û lêkolînan pir bûn. Di wan deman da destpêkirî hemû zanyarên kurd yên bi nav û deng, sîyasetmedar û şoreşger, Mêrxasên Yekîtîya Sovêtîyê û Mêrxasên xebata sosîyalîstîyê kirin azirî. Em dikarin gelek nimûneyên feşkirina dîroka kurda ya berê bînin. Nimûneyeke balkêş - Çîngîz Îldirim e. Ew şoreşgerê kurd yê bi nav û deng di dokûmêntên xwe yên partîyayê da û di nameyên ku ji serokên dewleta Sovêtîyê S. Kîrov û S. Orconîkîdzê ra şandine, gelek cara bi sebebên cihê-cihê li kurdîtîya xwe xwedî derketîye. Lê dîsa jî azirî wî azirî dihesibînin. (Binhêre: Polonskî L., "Çîngîz Îldirim", Bekû, s. 1986, rûpel 233, 240, 247, 273 û yên mayîn).

Şair û xunedarê kurd yê bi nav û deng di sedsala 17a da, ronahîdarê îdeya kurda ya miletîyê Ahmedê Xanî, ku efrandinên xwe bi kurdî nivîsîne û tu xetek bi tirkî ne nivîsîye, azirîkî bi paşnavê Huseynov wî nav kirîye wek "şairê kurda-tirka". (Binhêre: A. A. Huseynov, Jîyan û mêrxasî, Moskva, s. 1987).

Di pirtûka akadêmîk Z. Bûnîyatov ya bi sernavê Hukumdarên jin yên rohilata musulmanîyê da malbetên kurda yên Şikakî, Rûzakî (Rojkî) û yên mayîn, ku malbetên bi nav û deng in û şika tu pêşekzana tuneye ku ew kurd in, ser azirîya hatine hesibandinê. Tiştekî balkêş e, ku dîrokzan-tirkzanên azirî bi hemû pirsên dîrok û aborîya Tirkîya nû û kevin va mijûl dibin, xênji pirsekê - pirsa kurda. Hewaskar e bidne kivşkirinê, ku di çend kovarên welatên dereke da (yên kurdî û înglîsî) yekşivêtîya (minanîhevbûn, hevşibandin) rewşa kurdên Azirbêcanê û Tirkîyê tê ber çava, ji ber ku kûrsa sîyasî yek e.

Dawîyê em dixwezin guhdarîya xwendevana daynine ser ecêbeke giran, ku pirsa me va girêdayî ye. Herêma Kurdistanê (dû ra bû navçe) ji holê hate rakirinê, lê rojnama ku organa wê bû -"Sovêtskîy Kûrdîstan" ("Kurdistana Sovêtîyê"), heta dawîya salên 50î jî derdiket.

CAUCASUS KURDISH SCIENTIFIC RESEARCH CENTER
Enstituya Kurdî ya Qefqasyayê
405632427